

welat

Şerê
dînazoran

Rûpel 4



Sal:1 Hejmar:48 17-23 Çile 1993 5000TL (KDVD)

Rojnameya Hefteyî

Kurdistan dinale

Dewleta Tirk, bi hemû hêzên xwe ve, li Kurdistanê di qirkirin û talankirineke hov de ye. Bi êrîşên leşker û cerdevanan, di carekê de, bi dehan kes tene kuştin û birîndar dibin. Bi baleftaran, gundên çiya hildiweşinin. Rê dibirrin, rêwiyan dikujin. Di vê heftiyê de, bi êrîşên bi vî rengî nêzikî 30 kesî hatin kuştin.

Ne tenê bi çekan, lê bi gelek metodên din jî, qetliama xwe didomînin. 49 gundên Kurdistanê, îro di bin talûka birçibûnê de ne. Dewlet nahêle ku xwarin bikeve gundên Eruh û Şirnexê. Armanca ambargoyê; valakirina gundên Kurdistanê ye. Ji bo vê jî, van metodên li dijî mirovahiyê bi kar tîne.



Melayên
Kurdistanê

Rûpel 7



Ji pênûsa
Apê Musa
Yaşar
Kemal

Rûpel 16



Paul
Eluard

Rûpel 13

REWS



Abdullah Keskin

'Şev û Rojên Evîn û Cengê'

"Her meh, roja kovar derdiket me xeber distand ku komek zilam ji bo kovarê bixwîn çemê Uruguay derbas dibin.

"Bîst heb in. Serekê wan mamosteyekî 60 salî ye. Demêke dirêj di girtîgehê de maye.

"Sibehê ji Paysandu derdikevin rê, derbasî erdê Arjantinê dibin, Crîsîsekê dikirin û li qehwê rûdin. Li wê derê yek ji wan kovarê bi dengê bilind dixwîne. Lê dihisin û munaqeseyê dikin. Xwendin tam rojê dom dike. Wexta xelas dibe kovarê diyarî xwediyê qehwê dikin û vedigerin welatê min î ku kovar lê qedexe ye.

"Bi tenê ji bo vê jî be hêja ye ku mirov zehmetiyan bikişîne."

Ev bûyer min ji kitêba rojnamevan û nivîskarê Uruguayî **Eduardo Galeano** ya bi navê **'Şev û Rojên Evîn û Cengê'** wergerand.

Kovara **Crîsîs** di demêke pîr dijwar de derdiket. Her meh girtîgehek vedibû û tijî dibû. Tirs hakimî her tiştî bûbû: "Tirsa xwendinê, tirsa guhdarîkirinê, tirsa kar nedîtinê, tirsa kar windakirinê." Tirs li her qadê civakê belav dibe. Uru-

guay dibe welatekî bêdengiyê. "Sansur, dibe Eduardo Galeano, wexta ku her mirov tewr û gotinên xwe sansur dike digihîje serfiraziyê."

Dewlet bi hemû hêzên xwe ve êrîşî gelê Kurd û sazgehên wî yên demokratîk dike. **Welat** jî, ji van êrîşan nesîbê xwe distîne. Rojnameya me xwerû bi Kurdî ye, li Stenbolê derdikeve lê, li welatê Kurdan Kurdistanê qedexe ye. Dewlet ji bo dengê me qut bike her tiştî dike. Berê me li pêşerojê ye. Welat, li dijî hemû zehmetî û abluqeyan wê bidome, wê xurtir bidome.

Tiştê herî xirab insanên me êdî hissiyat û hassasiyeta xwe winda dikin. Hûn nabînin di Welat de em jî wek raporên Meteorolojiyê "Bûyerên Hefteyî" dinivîsin. Talûkeya mezin ev e. Di hefteyekê de kuştina 15-20 kesî ji herkesî re normal tê.

Ha Uruguay 1975'an, ha Kurdistan... Kurdistan: Welatê ji her alî ve sînor kirî. Serxet- bixet, bakur- başûr, li her derê sînor. Girtîgeh her roj zêde dibin, goristan jî fireh... Bajar, gund, tax, sikak, hewş, mal dibin girtîgeh. Girtîgeha mezin dixwazin di serê insanên me de çêbikin.

Eduardo dibêje: "Berî dibistan (mekteb), nexweşxane û febrîqeyan, televizyon digihîjin van deran: "Li Kurdistanê jî rojnameyên Kurdan qedexe dibin, ji bo

televizyon belav bibe kampanya vedibin. Li welatê Eduardo tiştê herî serbest buha (fiyet) bû. Li welatê me jî kuştin. Îro li Kurdistanê, ji kuştinê erzantir û hêsantir çî heye?

Tiştê herî xirab insanên me êdî hissiyat û hassasiyeta xwe winda dikin. Hûn nabînin di Welat de em jî wek raporên Meteorolojiyê "Bûyerên Hefteyî" dinivîsin. Talûkeya mezin ev e. Di hefteyekê de kuştina 15-20 kesî ji herkesî re normal tê.

Eduardo dinivîse: "Bi îşkenceyê mirina yekemîn, di 1964'an de li Brezîlya bû skandaleke neteweyî. Bi îşkenceyê mirina 10. di rojnameyan de incex hate dîtin. Mirina 50. jî wek bûyereke "normal" hate qebûl kirin."

Her roj, her kêfî dilê me tê guvaştin. Hêstir li me qedexe ne. Her roj çend xaniyan bi ser me de hildiwêşînin? Naha li ku derê, çend kes dikevin erdê? Xwîn li çend deveran dipijiqe ser berf û axê? Helbet bedelê azadiyê ne hêsan e. Welatekî serbixwe bi tîlîfî û çepikan çênabe. Ji jiyaneke bêrûmet mirin ne çêtir e gelo?

Şev û rojên me di nav evîn û cengê de derbas dibin. Jiyan û ramanên me bi evîne hatine honandin. Li ber me armancên insanî hene. Em naxwazin tu kes -hele ew ên ku bi salan jiyan li me kirine jehr- êdî li ser navê me bi jiyana me bilîzin, hecê deynin ser pêşeroja me.

"Gelo çiqas insan di nav sînorên welatê xwe de surgun kirî ne? Kijan îstatîstîk wan ên ku mehkûmê sertewandin û bêdengiyê bûne qeyd dike? Qetla hêviyan ji qetla insanan ne dijwartir e?"

FERHENGOK

- Afirîner: Îcatkar
- Aram: Sebr, hedan
- Dûgel: Dewlet
- Desthilat: Otorîte, selahiyet
- Dijûn: Çer, sixêf
- Destûrname: Îcazetname
- Fîrç: Kramp
- Gencîne: Xezîne
- Herzing: (hûçkirin)
- Honandin: (örmek)
- Hûrtinazî: (ince espiri)
- Jêder: Jêza, çavkanî
- Keser: Kovan (üzüntü)
- Kewin: Daxkirin (dağlamak)
- Kûndax: Pêçek, qimatik
- Nap: Neynokên sewalên dirende
- Naprok: Pençe
- Naturî: Xwezayî, siruştî, tebîet
- Nepen: Nependî, veşarî
- Neteweyên Yekbûyî: Koma Miletan (Birleşmiş Milletler)
- Pile: Rade (derece)
- Pitik: Landik (bebek)
- Pêngav: (atlim, teşebbüs)
- Penaber: Muhacir
- Pesar: Çol, (kır)
- Pêdivî: İhtiyaç
- Pêşangeç: Cihê raxistina berhemên huncerî (sergi)
- Pêt: (alev)
- Qanûnê Bingehîn: Qanûnê Esasî (Anayasa)
- Rasteqîn: Misoger, heqîqet (gerçeklik)
- Rêgal: Rê, yol
- Rîqaço: Kramp, fîrç
- Rûxandin: Hilweşandin, tahrîbkirin
- Serinc: Jêrenot, dipnot
- Stêrenasî: Astrolojî
- Stêrezanî: Astronomî
- Saw: Tirs, xov
- Temen: Emir
- Tiral: Tembel
- Tirane: Henek, yarî
- Veriskî: (sökülmek)
- Wech: Rû, rûçik
- Werze: Mewsîm, demsal
- Xasûk: Kone, qurnaz
- Xwerûstî: (doğal, normal)
- Zindî: Bi can, jîndar

Sed û yek hêk

Çirokeke me Kurdan heye dibêje: Carekê yekî gundî li ber cotê xwe bû, cot dikir. Ji nişka ve gîsinê aletê wî li tiştêkî sekîna, halo nêrî gava sewilkekî tijî zêre zer di bin erdê de ye. Pîr dilxweş bû. Ber bi êvarê ve hate malê, lê berî ku li jina xwe mukir were ji xwe re got ku ezê pêşî wê biceribînim, ka wî tiştê ez jê re bibêjim wê weşere yan na. Bakire jina xwe: "Pitê were! De bi Xwedê tiştê ku hatiye serê min nehatiye serê tu kesî. Ezê ji te re bibejim, divê tu ji tu kesî re nebêjî, lê êdî ezê tu caran nikaribim serê xwe ji şerma di nav xelkê de rakim." Jinê lê vegeand: "Pepû ez! Ezê ji kê re bibêjim? Gotin ji vî diwarî derdikevin lê ji devê min dernakevin." Gundî got: "Pitê, ma ez çî bibêjim? Doh li ber cot min, hêkeke kir!"

Jinikê jê re sond xwar, ku ji kesî re nabêje. Lê roja din dema li ber tenûrê bû, nan dipat, cîrana wê hate cem. Ji xwe re ketin nav gotinan. Gotin pê xweş bûn, êdî hew xwe girt. Piştî ku sed soz ji cîrana xwe standin û kir, ku bi hemû quran û pêxemberan sond bixwe, da tiştê hati serê mêrê wê veşerê. Jê re got ku mêrê wê jinê doh li ber cot du hêk kirine. Cîranê êvarê dereng, piştî şevbuhêrkê kete ber mêrê xwe û ji xwe re ketin nav gotinan. Gotin bi wan xweş bûn, êdî jinikê hew xwe girt, rabû soz û ji mêrê xwe stand, da serpêhatiya cîranan veşerê û jê re got, ku cîranê wan pêr li ber cot sê hêk kirine.

Cîran gote cîran, malê gote malê, tarê gote tarê, gund gote gund bajar gote bajar ta gotin giha mîr. Mîr li ser vê serpêhatiya nebûyî pîr matmayî û xwest, yê gundî bi çavê serê xwe bibîne, şande pey, ew anîne diwanê li ber destê mîr danîn. Mîr jê pirsî: "Bêhvan kes! Ma rast e te li ber cot sed û yek hêk kirine? Gundî got: "Mîrê min tu bi aniya bavê xwe kî, yê ev gotin gihandî te, got min çend hêk kirine?" Mir got: "Bi aniya bavê min, got ku te sed û yek hêk kirine." Gundî çiroka xwe û sewlîkê zêran û jina xwe ji mîr re got. Piştî mîr rastî tev nasan kir, gundî şande mala wî.

Carê me deng û bahsên welatê xwe di riya masmedya biyaniyan re dibihîst. Masmedya biyaniyan pêşmergeyên me dikirin çete û terorîst, welatparêzên me dikirin xayîn, rêberên me dikirin xweferoş, berxwedanên me dikirin texrib, serhildanên me dikirin îsyân û şoreşên me dikirin leystikên imperyalîstan yan jî yên komûnîstan. Lê bi saya serê navgînên hayedarî, yên me Kurdan, ku derketine meydanê weke rojnameya Welat û yên din, êdî bûyerên li welatê me navên xwe yên rast, cihên dirust û gewdên (hecîmên) objektîf distinin. De bila vêca masmedya Tirkî ne sed û yek hêk bike, lê dixwaze bila du hezar û sed hêkî jî bike. Ê me, em bi xwe êdî baş dizanin, ka gundiye me di ber xebata xwe re çî dîtîye.

Serinc: Masmedya Tirkî dibêje ku lêşkerên wan 2000 gerila kuştine.

Gernûsê Zaxwirani

Riya bi rûmet

Xebatkarên welat yên hêja; dema we xweş be..

Bi bûyerên Şirnexê re Komara Tirk carekê din rûye xwe yê bi qirêj li pêş çavan raxist. Şirnex û dora wê bombebaran kir, bi sedan birayê me yên Kurd qetil kir, xanî û karxane bi ser hev de anî xwar, gelê Şirnexê jar û perîşan kir. Piştî wê serokwezîrê wê li bajarê Amedê li hev civiyan, hinek fort û zirt dan xwe, tewan jî tev li PKK'ê bar kir û gotin va em diçin lê di demêke kin de emê werin û ji pirsên xelkê re bersivan bidin va em li vir dipirisin?

We Şirnex da ber topan, û zar û zêçan qir kir, bajar wêran kir ev ji bo çî bû? Hûnê hor roj rojnamevanekî me wekîlekî me, welatparêzên me, yekî ku li dêr û dora xwe tê hezkirin, hûne bi hovîtî bikujin û navê "Faîlî meçhûl" deynin ser, hûne bersiva me çawa bidin? Îşkence li ser gelê Kurd ji zarokên du, sê salî bigre heta ku bigihê hefte heştê saliyan didomîn hûnê bersivên me çawa bidin? Ku li tu derê cihanê nehatiye bihistin reng qedexekirin û hîna gelek tiştên ku ez nikarin li vir rêz bikim.

Bi kurtî her roja li Kurdistanê derbas dibe, bi talan, bi wêran, bi dilşewatî, bi girî, bi hawar û sedemê wan gişan jî dewlet e. Hûnê bersiva van pir-

san çawa û bi kîjan rûyî bidin? Bersiv ji van pirsan re heye?..

Car din jî di weşan û axaftinên xwe de dibêjin "Em û gelê Kurdistanê wê bibin yek û PKK di nav xwe de biperçiqînin. Ev gotin wê meselokê tînin bira me. "Yek di riyekê re derbas dibe, yekî din ji paş ve kotekekê bi hêz pê ve datine. Gava ku yê lêdan xwarî di zivire yê ku lîxistî dibêje:

-Wîî tu bû? Welle min got qey birayê te ye. Ji qusûra min biborî tu zanî ez pîr ji te hez dikim." Em û Kurd wê bibin yek û PKK biperçiqînin wê bûyerê tîne bira me.

An jî dibêjin: "Emê mesrefê mezin li Kurdistanê bikin, karistanan vekin." Lê me tevan bi çav dît yê ku gelê me bi hewla xwe jî tiştê çêkiribû tev bi ser hev de anîn xwar. Erê ewê mesrefê bikin. Hîn zêdetir heps û zindanan lêkin, navgînê îşkenceyên nûjen ji me re binin, pereyan zêdetir bidin cahşikan ji bo cahşikaniya xwe bidomînin em vana dizanin. Lê belê karistan maristan van lorîkê zarokan êdî kar nakin...

Em tev bi devkî gazi dikin, berî her tiştî Welat rêça rast û durust li pêşî ya gelê Kurd hatiyê kişandin. Gel tev de daye ser vê rêça bi rûmet û gav bi gav bi pêş ve diçin. Tu kes, tu hêz nikarin van ji ser vê riyê vegezinin.

Zeynep Tufan

Bûyerên hefteyê

Bismil dewletê protesto kir

Navenda Nûçeyan- Li Bismilê, bi kuştina şoreşgerekî protestoyeke girseyî li dar ket.

Roja 11'ê Çileyê, şoreşgerekî PKK'van, ji alî hêzên dewletê ve hate kuştin. Li ser vê bûyerê esnafên Bismilê dikanên xwe girtin, şofêr ji dev ji kar berdan. Ev livbazi 2 roj domiya û li seriya 300 esnaf beşdarî vê livbaziyê bûn.

Hêzên dewletê mudaxaleyi livbaziyê nekirin û ev livbazi piştî 2 rojan bi serfirazî xelas bû.

8 Çile 1993 -Li Şemrexê (Mazidaxiyê) gerilayan erebeya qeymeqam gullebaran kirin. Qeymeqam birin ne stand. Şofêrê erebeyê mir. Li Diyarbekirê mamosteyekî endamê Egit-Sen'ê Şuayip Kandemir ji alî hizb-î kontrayan ve bi dar û keviran hate birindar kirin.

9 Çile 1993 -Li Çinarê esnafan ji bo gerilayekî ku li nêzikî navçeya Depe (Qereqoçanê) hatibû kuştin, kepengên xwe girtin. Û li gundê Xirbizil ji, ji bo vî gerilayê 1000 kesî merasîmek çêkirin.

Li navçeya Erxeniyê hêzên dewletê û cerdevanan avêtin ser gundê Salihli, gelek gundî xistin bin çav. Li navçeya Qoserê, li taxa Türkayê gerilayên avêtin ser mala hizb-î kontra M.Ali Kurtay, wî gullebaran kirin; kuştin. Piştî vê bûyerê sê deqîçe bi şûn ve vê carê ji gerilayan li taxa Köprübaşı avêtin ser mala hizb-î kontrayekî din Cemil Kandemir û wî ji kuştin. Piştî vê bûyerê ji hizb-î kontrayan li taxa İpek'ê firoşkarekî serxwar kuştin.

10 Çile 1993 -Li Farqînê hizb-î kontrayan Sîmsar Mehmet Çiçek kuştin.

11 Çile 1993 -Li navçeya Bismilê, piştî ku gerilayek di nav bajêr de hate kuştin esnafên Bismilê ji bo protestokirina vê bûyerê kepengên xwe girtin. Şofêran ji qontaxên erebeyên xwe qefaltin.

Li navçeya Duhê gerilayan avêtin ser gundê Busî, 2 cerdevan kuştin, minibusê û erebeyeke dewletê şewitandin.

Li Batmanê li taxa İpraxazê, gerilayan erebeyeka ku hizb-î kontra tê de bûn gullebaran kirin, 2 hizb-î kontra birindar kirin.

Li İzmirê li taxa Gümüşpala endamên ERNK'ê ajan Mehmet Utkan û jina wî birindar kirin.

12 Çile 1993 -Li navçeya Xelatê, di navbera hêzên dewletê û gerilayan de şer derket, 3 gerila hatin kuştin.

Li Farqînê muxtarê gundê Ka-


raçalar ji alî hizb-î kontrayan ve hate kuştin.

13 Çile 1993 -Li navçeya Cizirê li gundê Xirabreşkê hêzên dewletê û kontragerilayan avêtin ser mala Davut Ergün. Davut Ergün li malê nedîtin. Kesên di mal de tev gullebaran kirin û 5 kes kuştin.


Li Midyadê erebeyeke ku ji gundê Çayirli diçû gundê Üçköyê, ji alî kontragerilayan ve hate gullebarankirin. 7 gundî hatin kuştin, 11 jî birindar bûn.

Li Cizirê ji gundê Misurî 2 gundî ji alî kontragerilayan ve hatin revandin û bi îşkenceyê hatin kuştin.

Li Diyarbekir li taxa Baxlarê mamoste Zübeyir Akkoç û Ramazan Aydın Bilge ji aliyê kontragerila ve hatin kuştin. Egit-Sen'ê ji bo protestokirina van cinayetên gazi mamosteyan kir.



Zübeyir Akkoç



Ramazan Aydın Bilge

Hêviya mezin Meclîsa Neteweyî

Î. Xort

Gava ku miletek bingeha têkoşîna serxwebûna xwe diavêje, pîrr tiştan dixê programê xwe û li gorî wê programê dixwaze bimeşe. Car caran ew program zû pêk tê û car caran jî, dereng pêk tê, an jî pêk nayê, ew program tê guherînin! (ev rastî ji bo miletê ku têkoşîna hemdemî dabe-danîbe ber xwe ye).

Mirov li dîrokê û li têkoşîna miletên din dinêre, têkoşîna wan pîrr dirêj dom kiriye û di nava vî



Meclîsa me ya Neteweyî, ne weke meclîsên dewletên serbixwe ye.

wextê dirêj de, pîrr ketine û rabûne. Ji bill vê rastiyê jî, pîrr tiştên mezin di nava wextekî kin de nekirine. Em vana ne ji bo ku têkoşîna miletên din biçûk dibînin dibêjin. Ji bo ku; em miletên bindest ji xebata xwe û xebat û serpêhatiyên miletên din dersan derxînin, dibêjin. Ji bo ku em karibin bi gavên hîn qewintir ber bi azadiyê ve bimeşin û destê xwe dirêjî hevûdu bikin.

Ji roja ku gelê Kurd dest bi têkoşîna xwe ya hemdemî kiriye ta îro, li gorî dîroka mirovahiyê û welatan, pîrr kin e. Lê gava mirov, vegere û li avahiyên gelê Kurd binêre, pîrr tişt hatine guhertin û avakirin. Wekî; Partî, artêş, enî, çapemenî û hwd.

Yek ji van avahiyên jî, Meclîsa Neteweyî ye. Bê guman ev gav, ji gavên ku ta îro hatine avêtin mezintir e. Ji ber vê mezinbûna wê jî, wê hêviyên me jî, mezintir in. Ger meclîs bersiva van hêviya bide, hem wê karibe karekî xweş bike û hem jî wê bikaribe bijî.

Di rewşa îro de, divê endamên meclîsê, bi pîrranî zimanên biya-

niyan zanibin, diplomasiyê bi kar binin, têkiliyên xwe bi parlamenterên dinê re xurt bikin, propagandaya têkoşîna îro bikin û rehên xwe ji gelê xwe neqetînin. Ev tişt wê meclîsê xurt bikin.

Ji bo ku karibe jiyana xwe xurt bike û bi başî bidomîne jî, divê nebe mala burokrasî û bêkarbûnê! Meclîsa me ya Neteweyî, ne weke meclîsên dewletên serbixwe ye. Berî her tiştî veşartiyê û pîrraniya endamên wê ne li ser xaka welêt in. Bê cih û war e. Wekî meclîseke surgun û gerok (gezgin) be. Ji bo vê yekê, wê gelek zehmetiyên jî bikişîne. Ji alî aborî, konevanî, birêvebirin, cih û hwd. Dibe ku pîrr xeletiya jî bike, lê em bawer in ku weke her avahiyên Kurdan wê zû xwe nû bike û li ser bingehê qewîn rûnê û mizgîna rojên azad û serbixwe bide.

Her gav avêtinek, bi xwe re astengiyên jî tîne. Lê ev astengî, her ku vedirîsin, gelê bindest ber bi rojên ronak û xweş ve diçin, serkevtina wan astengan, dibin weke gul, binewş û sosinan.

HAWAR

Dilbixwîn

Ji hunerfiroşan hunerê biparêzin

Hunermend, hozan, dengbêj, sazband...û hwd. Di fêr-hengê Kurdî de her gotinek ji van gotinan wateyeke (maneyeke) wê ya taybetî heye.

Di nava çanda Kurdî de, li gora ku rûpelên dîrokê nişan didin, dengbêjiyê roleke gelekî giring leyistiyê, wisa jî bûye xwediyê payeke berz û bilind.

Dengbêjan; derd û kulên gel anîne ziman. Problem û pirs-girêkên (sorun) wan şîrove kirine, qehremaniya di şeran de, gernasîya lehengan, dildariya evîndaran... Dîroka gel li şûna nivîsandinê bi dengbêjiya xwe parastine. Ji lew re em îro bûyerên ku xwe dirêjî sedsalên derbasbûyî dikin, ên ku nehatine nivîsandin, dibihîsin, nû dikin, lêkolînan li ser çêdikin û bi dorfireh belav dikin û diweşînin.

Bi dehan gernasî me û bi dehan destanên me yê evîndarî û şerkarî bi xêra dengbêj û stranbêjan heya vê rojê zindî û vejandî mane. Bê guman, dema em bi firehî li ser vê pîrs û mijarê (konu) bisekinin, em gelek aliyên wê yê nîştîmanperwerî, sosyolojî, pesindarî, rexnegirî û hwd. di bin çavan re derbas bikin. Ango, bi kurtahî ev pîrs şîrove nabê.

Di nêrîna min de ji hêla psikolojî ve du cure dengbêjî hene:

1. Pozîtîv

2. Negatîv

Dengbêjiyek heye mirov hez dike lê guhdarî bike. Gel li

dora xwe dicivîne, yekîtiya çêdike, êş, keder û ahînen gel tîne zimên. Dibe dergê hestên gel. Ev dengbêjî roleke pozîtîv dileyze. Em hemû bi dilgeşî pêrgîniyê wê berhemê diçin, piştgiriya wê dikin û jê re dibin alîkar. Çima? Ji ber ku di babetekê de tiştêkî dibêje.

Yek jî heye berevajiyê vê rola pozîtîv, roleke negatîv dileyze. Li şûna ku bicivîne direvîne, dipelîşîne... Weke mirovekî ku bacanên sor (firingî) bihênciqîne, dihênciqîne. Mirov ne amade ye ku kêliyêkê jî lê guhdarî bike. Eger mirov bi dorfirehî bikole, dibe ku girêdanên wê bi şerê taybetî yê ku dijmin li hemberî me dide meşandin jî, re hebe. Bi sedan ev cure "dengbêj" li bazaran tene dîtin. Min ji hevalê xwe yê hunermend Iqbal Hîcabî pîrsî: "Em dikarin çî navî li van 'dengbêjên bi nav û deng' bikin?" Sivik kenîya û bersivand: "Gewende; ew kesên ku sîng û piştî huner, deng, enstruman, gotin û meqaman ji hev cuda nakin, bi rastî layiq in em nav li wan bikin 'Gewende'. Gelo, wê bikaribin barê Gewendetiye hilgirin û rola gewendeyan bileyzin."

Muzîk û hunera me ya ku xwe ji sedsalan ve parastiyê di talûkeyê de ye. Di nava diranên hunerfiroş û bazirganên de ye.

Meydan vala maye, diz pîrr bûye. Heçî kesê ku dikare biqîrîne di şev û rojekê de dibe "dengbêj" û hunermendekî "ecayîb". Ne tenê ev, rengên ala me jî, ji xwe re kirine jêderên diravî (madî). Xwe bi kesk û sor zêr dixemilînin, hezar navî li xwe dikin û mîna şemamokan derdikevine bazarê.

Dengbêjî û hunera Kurdî ewqasî ne karekî erzan û sivik e, ku her kes serê xwe rake, biçê cem tembûrvanekî Tirk û bibe hunermend. Mafê tu kesî û bi çî sedemê dibe bila bibe, tune ku ji vî alî û ji wî alî bidize, biguhêre û li dawiyê bibe "dengbêj".

Xwedî lê derkevin, biparêzin, pêş ve bibin, fireh bikin, bila hunera me di çarçova çend ticaran de nebe berhemeke bermîrî. Ne wisa ye, lê mixabin dengbêjî bûye karê bêkaran.

Nivîskar, hunermend, lêkolînan... Kar û barê hemûyan e ku rê li pêşîya hunerfiroşan bigirin. Û sembolea bajarvaniya Mezopotamya biparêzin.

Nûçeyên Derve- Hêzên Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA), Fransa û Îngilistan di roja 13.1.1993 an de, saet li derdora 17.30 an, ji nû ve cerdî ser Iraqê kirin. Hêzên DYA û hevalbendên wê, di vê cerdê de, balefirgehên leşkerî, tevî çekên giran ên Iraqê rûxandin (îmhakirin).

Piştî Şerê Kendav (Xelîc) ê, dor li Sedam hatibû girtin. Gelê Iraqê di bin ambargoya Nete-weyên Yekbûyî de, rojên gelek dijwar jiya-dijî. Pirraniya tesisên tendurustî, qenalizasyon, şebekeyên avê, navendên belavkirina ceryanê, bi kurtî çî hebe ji bo jiyane hemû, bi bombeyên balefirên Amerîkayê hatibûn rûxandin. Ji bilî 150 hezar leşkerên Iraqî, bi dehhezaran gelên sivil, ji birçibûn û nexweşînan mirin. Ev mirin û astengiyên di jiyana Iraqîyan de, niha jî didomin.

ŞER AVA JIYANA DÎKTATORAN E

Di dîroka dinyayê de, jiyana dîktatoriyê, bi şer û îşxalan pêk hatiye. Dîktator, ji bo desthilatê di destê xwe de bigirin, gelê xwe bi hisên netewemendî û nijadperestî di şerên bê dawî de girtine. Mînak ji bo vê gelek in. Hîtler, Mussolîni, Franco, Napoleon...û îro jî Sedam bi vî rengî desthilatê di destên xwe de girtine. Şer bûye sedemê hebûna dîktatoriyê. Lewre gel, bi hisên nijadperest ditevize û di dawîya şer de jî bi tu awayî bi hisê xwe ve nayê.

Sedam jî, yek ji wan dîktatorên, dawîya qirnê bîstan e. Şer rasteqîna Sedam e jî. Ew jî gelê xwe bi hisên nijadperestî dadigire û her carê ber bi macerayekê ve dikişîne. Ev e, di domana deh salan de, şerê bi Îranê re, ku nêzikî milyonek Iraqî di vî şerî de hatin kuştin, bûn qurbanan desthilata dîktatoriya Sedam. Dû re jî, dagirkirina Kuweytê.


Lê Kuweyt jî bo Sedam gepeke mezin bû, nikaribû daqurtîne

Muttefîkan dîsa Iraqê bombe kirin

Şerê dînazoran



Qesabê Helepçe: Sedam



Mûcîdê 'nîzama nû' Bush

û dawî di qirikê de hiştin. Lewre Kuweyt ne çoleke xir û xalî bû. Petrola Kuweytê bala hemû dinyayê li ser xwe civandibû. Lê kontrola vê petrolê di destê Amerîkayê de bû û ji xwe re li şîrîkan nedigeriya. Jixwe Sedam jî, doza şîrikatiyê nekir. Raste rast çû û Kuweytê dagir kir. Berî xanedanên Kuweytê da û yên ku li hember derketin (ku ji 60-70 kesî nebuhurin) jî kuşt. Dû re îlan kir ku Kuweyt bajarekî Iraqê ye. Û li hêviyê ma ku dînya serî li ber Sedam bitewîne. Ev Xasûkê Rojhilata Navîn, gelek li benda bersiva xwe nesekîni.

Amerîka, Nete-weyên Yekbûyî (ku bi tenê ji bo berjewendiyên

Amerîka dilive) civand û di şevê de, biryara mudaxaleya leşkerî stand. Bûyerên ji vê pê ve, ne vefarî ne. Tevî hemû dinyayê me jî, vî şerî di televîzyonên xwe de, pêre-pêre temaşe kir. Pêşî Sedam jî Kuweytê derxistin, dûre jî, wî di Iraqê de, di nav çend bajaran de, asê kirin. Hêzên Sedam, hem jî başûr hem jî, ji bakurê Iraqê dûr kirin. Li başûr Şîî, li bakur jî Kurd, bi vî awayî ji zora Sedam rizgar bûn. Û Sedam jî hem jî dêrê, hem jî, ji mizgeftê bû. Lê desthilat, her yê wî bû û ji forta xwe tu tişt wînda nekiribû.

Piştî Şerê Kendav (Xelîc) ê, Nete-weyên Yekbûyî (Koma Katibên Amerîka) di nav erdê

Iraqê de, dest bi îmhakirina çekên Iraqê yên stratejîkî kirin. Iraq, wek mexlûbê Şerê Kendavê, ji hemû biryaran Amerîka re serî-tewand. Lê, di nav gelê xwe de, hê jî qehreman bû. Lewre gel jî tu-rastiyên şer agahdar nîn bûn. Navgînen ragihandinî, ji pesn û propagandayên Sedam pê ve tu tiştî nediweşandin. Sedam li hundir weke şer, serbilind û bi ore or, lehengê herî mezin bû, lê li derve mîna rûviyê dûvjêkirî, serî tewandî û bêdeng bû. Belê car caran, jî ber muxalefeta hundirin, dengê xwe ji NY're jî bilind dikir. Lê, her carî jî paşve zivirî û deng birî.

Amerîka jî bo parastina Ku-

weytê, hêzeke mezin li Rohilata Navîn digire. Li bakurê Kurdistanê Hêza Çakûç û li Tirkîyê jî, li wargehên weke Încîrlîkê, balefirên xwe her tim ji bo şerêkî amade digire. Her çiqas ev rewşa îro, ji bo başûrê Kurdistanê, derfetên nû afirandibe jî, di pêgerojê de, bicihbûna Amerîka li Rojhilata Navîn, jî bo hemû gelan talûkeyeke mezin e. Îro, desthilata Sedam ji hîmê xwe ve hejriyaye. Û ev jî bo Kurdên Başûr rîya serbixwebûnê vekirîye. Lê weke ku gelek caran îspat bûye, welatên împeryalist li dû berjewendiyên xwe ne, dema berjewendiyên wan bi Sedam re bikeve rêçeyekî, dê gelek hêsan li Kurdan vegezin û hilweşîneke nû bête jiyân.

SEDAM CLINTON CERIBAND

Bi hîlbijartinên ji bo serokatîya Amerîka re, hêviyên Sedam jî zêde bûn. Piştî Bush hîlbijartinê wînda kir û Clinton bû Serokê Amerîka, ew roj bû cejna dîktatoriya Iraqê. Ji bin ve, dest bi hin xasûkiyan kirin. Armanca wan ceribandina rêveberiya Amerîka ya nû bû. Sedam digot qey, dê Clinton siyaseteke dinê bimeşîne. Di sînoran de, dest bi dagirtina çekan kir. Rampayên fuzeyan jî nû ve derketin holê û Iraq, ji şerêkî nû re xwe amade kir. Dû re, dest bi dizîya hin malzemeyên leşkerî kir. Bi vî armançî du car kete nav erdê Kuweytê. Û Sedam di radyo û televîzyonên xwe de gelê xwe vexwendiyê şerêkî nû kir. Got, "Ev cîhadeke nû ye." Lê rêveberiya Amerîka ya nû, her wek a berê jî tiştêkî wiha re aram nişan neda û bi balefiran, hemû çekên Sedam yên di sînoran de bi cih bûne rûxand. Eşkere bû ku, her kî were serî siyaseta Amerîka yek e û ew jî li gor nîzama nû birêxistina dîngelên dinyayê ye, împeryalizm e, dagirkerî ye û di vî nîzama nû de, pêdiviya wê bi figuranên mîna Sedam nîn e.

Li Sovyeta kevin hîlbijartinên meclîsê

Yêrîvan, Welat- Kurdên li komarên Sovyeta kevin a belavbûyî jî, ji bo hîlbijartina mebûsên Meclîsa Nete-weyî diçin ser sindoqan. Amadekariyên hîlbijartinên li komarên serbixwe heta 20'ê Çileyê 1993'an wê bidomin.

Rayedarek ji komîsyona hîlbijartinê, ji nûnerê Kurd-Ha yê Moskov, R.Cizre re vê daxuyaniyê kir: "Piştî 70 salan gelê Kurd vîna (îreda) xwe li Civata Dewletên Seribwxe (Sov-yeta kevin) jî derdixe holê. Gelê Kurd, li komarên Rûsya, Ukrayna, Kazakîstan, Azerbaycan, Ermenîstan, Gurcîstan û li komarên din, ji bo 7 mebûsên xwe hîlbijêre û di Meclîsa Nete-weyî ya Kurdistanê de bi cih bike, xebatên xwe bi coşeke mezin didomîne. Dê heta 20'ê Çileyê 7 mebûsên me tesbît bibin û di nav meclîsê de cihê xwe bigirin."



Nêzikî 3 meh berê, li paytexta Ermenîstanê-Yêrîvanê ji hêla welatparêzên Kurd ve şeveke bi coş pêk hat. Nêzikî 560 kes beşdarî şevê bûn. Avahiya ku şev lê çêbû, bi wêneyên serokatîyê, şehîdên Kurdistanê, afîş û alên eniyê ve xemilî bû. (Herdu wêneyên jor)

Li paytexta Gurcîstanê Tbilîsî jî, şeveke bi vî şeweyî çêbû. Ev şev jî, ji hêla ERNK'ê ve li dar ket. Nêzikî 700 kesî beşdarî şevê bûn. Ev şev jî, bi bernameyê dewlemend hatibû amadekirin. Gelek hozan û hunermendên bi nav û deng, bi hunerên xwe dengê Kurd bilind kirin. (Wêneyê aliyê rastê)



Rapora CPT'ê

Cenevre, Welat- Di 21'ê Kanûna 1992 an de, Comite pour la prévention de la Torture (Konseya Ewropa Komîteya Rêlibergirtina Îşkenceyê) li ser Tirkiyê daxuyaniyekê weşand. Ev daxuyani, îşkenceyên ku di qereqol û girtîgehên Tirkiyê de dibin, eşkere dike.

Tirkiye, dewleta yekemîn bû ku di sala 1988 an de, "Peymana Ewropa, ya li dijî îşkenceyê" îmze kiribû. Li gor vê peymanê, CPT (Comite Pour la Prevention de la Torture) dikaribû li girtîgeh û qereqolên ew dewletên ku vê peymanê îmze kirine her dem bigere û tefîş bike. CPT, heta niha, der heqê tu dewletê de tu beyan neweşandibû, lewre, endamên CPT'ê ji alî hikûmetên xwe ve tene girêdan. Ji ber vê yekê jî, ev rapora CPT'ê, ji bo gelê Kurd û hemû rêxistinên ku li Tirkiyê mafên mirovan diparêzin destekeke mezin e.

Ev rapor ji alî delegasyona ku girtîgehên Diyarbekir û Enqerê tefîş kirine ve, hatiye amadekirin. Li gor delegasyonê, li Tirkiyê hemû metodên îşkenceyê tene bikaranin û îşkencekirin ji berê zêdetir didome.

Êrişa girtîxaneyê

Di 8'ê Çile ya 1993 an de nêzîkî 400 leşkerî êriş birin ser girtîxaneyê Meletê.

Girtiyar li hember vê êrişê deriyên qawîşên xwe asê kirin û barikat çêkirin lê leşkeran diwaran qul-kirin, bombeyên mijê û girîna avêtin qawîşên girtiyar. Dû re jî bi copan li wan xistin. Di dawiyê ve lêdanê de 63 kes birindar bûn. Birinên 4 kesan jî van xedar in. Daxwaza hevdîtina ebûqatan bi muwekilên xwe re ji alî rêveberiya girtîxaneyê ve nehat qebûl kirin.

Ji xeynî vê di 7'ê Çile ya 1993'an de li girtîxaneyê Mêrdînê jî bûyerêk bi vî rengî qewimî bû. Li wirê jî mudûre girtîxaneyê, dozger û leşker tevî hev avêtibûn ser girtîxaneyê û bi navê lêgerinê tehrîbatek mezin çêkiribûn.

Meşandina li ser agir li meclîsê

Mebûsê HEP'ê (Partiya Keda Gel) yê Mêrdînê Alî Yîgît bûyera şivanê gundê Çalê yê Nisêbinê anî rojeva Meclîsa Tirk. Şivanê 15 salî Î.A 25 roj di hundir de mabû û ew li ser agir meşandibûn.


Mebûs Alî Yîgît der barê bûyera şivan Î.A de pirsnameyekê da meclîsê da ku Wêzirê Karê Hundirîn İsmet Sezgin bersiv bide. Şivan Î.A 25 roj di bin çav de mabû û li Qereqola Jendermayê ya Nisêbinê û li Mêrdînê lê îşkence hatibû kirin, li ser agir bi piyên pêxwas hatibû meşandin. pirsnameya Alî Yîgît bi kurtî li ser kirinên hêzên dewletê ên li Kurdistanê, li ser îhlalkirina mafên mirovan, le ser qedexebûn û li ser suçdariya îşkenceyê hatiye amadekirin.

Kurmên darê dewleta Tirk tînin xwarê

Navenda Nûçeyan- Serokê Dadgeha Qanûnê (Anayasa Mahkemesi Başkanı) Yekta Güngör Özden, ev demek e bi beyanên xwe, di rojeva Tirkiyê de ye.

Yekta Güngör Özden, cara yekemîn, bi awayeke diwar êrişî ew kesên ku qala Kurd dikin, kir. Li gor wî, miletek bi navê Kurd tune ye û kî qala mafê Kurdan bike, îxanetê bi dewletê re dike. Yekta Güngör Özden, Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal jî, bi îxanetê tewandar dikir. Dû re destûr da ku qanûnên li rojavayê Tirkiyê tene ajotin, nabe ku li Kurdistanê jî bêne ajotin û Rêveberiya Taybetî jî, sistemeke normal e.

Piştî van beyanên Serokê Dadgeha Qanûnê Bingehîn, Serokkomar Turgut Özal jî, bi hin beyanan tevî ve guftûgoyê bû. Hê di domana ve guftûgoyê de, Turgut Özal du mirovên xwe tayîne Dadgeha Qanûnê Bingehîn kir.



Yekta Güngör Özden

Lê, Yekta Güngör Özden, tayîna van herdu mirovan nepejirand û wan tevî dadgehê nekir. Li ser vê yekê jî, ev şerê di nav Turgut Özal û Yekta Güngör Özden de, mezin û belav bû.

Yekta Güngör Özden, bi vî jî nema û rabû bela xwe di hin hêzên kevneperest da. Şûrê laîsizmê di destê wî de bû û li vî alî û li wî alî dihejand. Xwe mîna parêzgerê Kemal Atatürk dît û kî li

hember Atatürk tiştêk gotibe, bi îxanetê tewandar kir. Lewre jî, hêzên îslamî, Yekta Güngör Özden, ji xwe re hedef bijartin û bi riya çapemeniyê êrişî wî kirin. Ji nû ve beyanên Serokê Dadgeha Qanûna Bingehîn, di rojnemeyan de, weke nûçeyên herî grîng cihê xwe girtin. Yekta Güngör Özden, rojekê dibêje, "Min tehdît dikin," roja din, "Dê min bikujin," dû re, "Zarok û neviyên min

jî, di talûkê de ne", dawiyê jî, "Kî zane, dibe ku li telefona min jî guhdarî dikin" û hwd. Xuya ye, tirseke mezin li Yekta Güngör Özden peyda bûye û ketiye bin bandora psikolojiya kuştinê û weke tene zanîn ev hal ne halekî baş e!

Şerê di nav Turgut Özal û Yekta Güngör Özden de, hê jî berdewam e. Turgut Özal, gotina "hiqûqavanên eniya xerabiyê" bi Yekta Güngör Özden ve datîne, bersiva Yekta Güngör Özden ji wiha ye: "Hinek kes Turgut Özal dizixtikînin."

Di hemû qadên siyaseta Tirkiyê de, nizmî û bêsewiyebûneke mezin xwe diyar dike. Siyasetvanên Tirkiyê, ji bilî çêr (sixêf) û pevçûnê bi tu tiştêkî nizanin. Meclîsa wan, ji qehwexane û meyxaneyan bêhtir dibe şahidê gotinên bi gemar û çêran. Dewleta Tirk ji serê xwe ta hîmê xwe riziye û hemû sedemên hebûna xwe winda kiriye.

Kurd li ku derê bin zilm li wê derê ye

Navenda Nûçeyan- Teroora dewletê, li her derê milên xwe dirêjî Kurdan dike, an Kurd li ku derê bin, terora dewletê li wê derê ye.

Kurdên ku ji ber zilma dewletê, koçber bûnê û li metropolên Tirkiyê bi cih bûne jî, bi her cure zilm û îşkenceyê re jî rû bi rû ne.

Li herêma Ege, Derya Spî, Çukurova, Stenbol, Derya Reş, bi kurtî Kurd li ku derê dibin bila bibin, ji vî zilmê bê par nîn in.

Edene jî, yek ji wan bajarên e ku bi sed hezaran Kurd lê dijîn. Kurdên ku li Edenê bi cih bûne şiyar û welatparêz in. Ji ber vê yekê

jî, di bin nîrê zilma dewletê de ne. Roj nîn e ku bi sedan kes di bin çav de, di îşkenceyan de derbas nebin. Di yek ji van binçavkirinên girseyî de, pîrekeke Kurd, zarokê xwe yê du meh û nîvî winda kir. Jinika Kurd Dilek Onat, di 4'ê Çileyê de, tevî 17 kesan tene girtin û

îşkence dibîne. Di îşkenceyê de, ji ber derbeyên polîsan bêhal dikeve û wê radikin nexweşxaneyê û pitika wê yê 2 meh û nîvî jê distînin.

Terora dewletê, berê xwe daye her derê û edî zarokên Kurd di zikên dayîkên xwe de jî tene kuştin.

Tirsa Newrozê xwe ji niha ve diyar kir



Newroza 1992'yan li Cizîrê û Kurdistanê tevde bi beşdariyê girseyî hatibû pirozkirin.

Navenda Nûçeyan- Serokwezîrê Tirkiyê Süleyman Demirel, tirsî Newrozê ji niha ve diji. Mebûsê HEP'ê yê Şirnexê Orhan Doğan û Serokê Belediya Cizîrê Haşim Haşimî, ji bo gundên tene valakirin, pîrgirêkên koçeran û aborî bi Süleyman Demirel re biaxivin, serdanek pêk anin. Serokwezîr Süleyman Demirel, di vî serdanê de, ji bo di Newrozê de xwîn nerije, Serokê Belediya Cizîrê Haşim Haşimî iqaz kir.

Li ser vê îqaza Demirel, Haşim Haşimî û Orhan Doğan ve bersivê didin: "Mesûlên Xwînrijandinê, peywardarên dewletê ne, Cizîrî nîn

in." Di vî mijarê de, Mebûsê HEP'ê Orhan Doğan ve beyanê da: "Sedama ziyareta me, diyarkirina pîrgirêkên Cizîrê yên aborî bû. Me anî ziman ku dewlet, ji bilî rêlibergirtinên polîsî tu xizmet nabe heremê."

Pirsa Demirel ji me ev bû. "Dê di Newroza îsal de xwîn nerije ne wilo?" Ev pirsî Demirel jî nîşan dide ku, ji bilî çareserkirinên polîsî, li tu çareyî nagerin."

Diyar e ku Newroz, her tirsî dilê rayedarên dewletê ye û ev tirs xwe ji niha ve diyar kiriye.

Surgun, penaberî û hin problemên girêdayiyê wan - 2

Xerîbî zor e!

J. Espar

Belê, îro bi sed hezaran Kurd li Ew-rûpa wekî biyanî dijîn. Têkiliyên Kurdan wekî biyanî bi civaka nû re ango bi civaka Ew-rûpa re çawan e? Pirs û pirsgirêkên civaka Kurd li Ew-rûpa çi ne? Ji bo bersiva van pirsan xebatekî dûr û dirêj lazim e. Biyanî li ser van mijaran hin xebatên ilmî dikin. Divê em bi xwe jî xebatên wiha bikin. Lê, niha em bi kurtaî der barê van têkilî û probleman de hin agahdariyên biçûk bidin, da ku em bikaribin problemê nas bikin.

Bi rastî jî xerîbî zor e. Mirovê xerîb, ê jar û pelçiqandî ye. Heger ev kes an jî grub, ji ber mecbûriyete jî welatê xwe derketine û "serreş" in; zehmetî zêdetir dibe. Îcar heger we-

kî Kurdan welatê wan perçebûyî û di bin dagiriya hezar salan de be, tesîra penaberî li ser wan hin jî bêtir dibe. Çumku kesên Kurd rengê hatina wan çî dibe bila bibe, kesên birîndar in û jî civakeke nexweş tèn. Ew li ser axa xwe jî xwedî tu fonksiyonên civakî nîn in. Ew çaxa ku li bajarê xwe, li gundê xwe nê jî, ne wekî însanan xwedî maf in. Ew nikarin xwe bi zimanê xwe îfade bikin, ew bi kultur û adetên xwe mezin nabin. Dîroka wan veşartîye û der barê xwe de xwedî zanebûneke pîr basî jî nîn in. Jiyana kulturî bê normên xwezayî ye. Dezgeh û sazîyên kolonyalîst bi her awayî mudaxelayê şexsiyeta wan dikin. Mudaxelayê fikrandina wan, mudaxelayê xyalên wan dikin. Jiyana sosyal û civakî ya wan di bin tehdît û muda-

xeylên cur be cur de ye. Kurd wekî insan, çaxa ku Kurdistanê terk dikin, wekî şervanekî westiyayî ye. Ji ber ku jî aliyê jiyana sosyal, civakî û psîkolojîk ve di nava şerekî dijwar de bû. Bê guman şexsiyete û hemû têkiliyên wan, jî vî şerî zirar ditiye. Ev pirsên jorîn, ji Kurdan re problemên şexsiyete çêdikin. Kurd bi van problemên xwe tê civakeke xerîb û li vir, wê jiyaneke nû ava bike.

Ji ber wan sedeman jî, mirov nikare penaberên Kurdan û yê welatên mayîn bide ber hev. Ji ber Kurd naşibin tu mileteki. Kurd di serî de xwedî hin birînen kûr in. Problemên ku yekê Yewnanî li Swêdê an jî Almaniyayê rast lê tê Kurd jî wan qat bi qat girantir li welatê xwe rast lê tèn. Ew rewşa han jî paşê, di civaka nû de jê re

problemên mezin peyda dike.

Li gel van problemên berê, hin zehmetiyên civaka nû ango yê penaberî tèn pêşberî Kurdan. Kurd civaka xwe ya nû nas nake. Der heqê civaka nû de xwedî agahdariyên şaş an jî kêmtir e. Ji ber nezanbûna zimên, tu peywendiyê wî bi civaka nû re tune ne. Bi wî awayî navbera Kurdan û civakê gelek vedibe.

Nezanbûna zimane civakekê, ku mirov tê de dijî tesîreke pîr negatîfî li ser insan dike. Kilita têkiliyên sosyal zimên e. Çaxa ku zimên tune be der û dora, ji mirov re teng dibe û tîrsa tenemayîne dest pê dibe. Baweriya mirov li hember mirov kêmtir dibe, mirov jî civakê re dibe kûvî.

Civaka nû, ji mirov re çarçoveyêke nû daniye. Zanabûn û qabiliyete ku di civaka Kurdan de derbas dibûn, li vir nema pere dikin. Têkiliyên mirov ên sosyal dibin xwedî normên nû. Civak, şikleke nû dide mirov û mirov dike xwedî norm û pîvanên nû. Ev rewşa han jiyana mirov ser û bin dibe. Reaksiyonên kes an jî gruban, li hember vê rewşê cihê ne.

Ji ber hin probleman, Kurdên siyasî yê piştî 1980'yî li Ew-rûpa xesirîn. Ji wan gelek li Ew-rûpa xwe di hembêza problemên nenas de ditin.

Ën ku herî zêde dixesirîn jî, yê ku têkiliyên xwe ji civaka xwe ya berê jî binî ve qut dikin û dixwazin bibin Ew-rûpî ne. Ji ber ku ev ne hêsan e, zehmetî di du aliyan de jî heye. Civaka Ew-rûpa, te zû bi zû qebûl nake. Û tu jî wekî ku te di serî de bawer kiriye ku nikarî xwe biguherîni. Di vî warî de, gelek caran îdealîzekerîna civaka Ew-rûpayê dibe sebebê şaşiyên mezin. Her wiha redkirîna civakê an jî civaka Ew-rûpayê protestokirin jî, mîzîna jiyane xera dibe. Ji ber wan sedeman jî hemû kategoriyên civaka Kurd li Ew-rûpa xwediyê probleman in. Problemên penaberan, problemên jinên Kurdan li gorî kategoriyên din problemên zarokan hene. Problemê xortan ên mezin hene.

PLANA VALAKIRINA WELÊT DIVÊ BÊ XERAKIRIN

Jiyana Kurdan a li Ew-rûpa çiqas bi êş û keder be jî, hê jî Ew-rûpa jî bo hin Kurdan cazîba xwe wînda nekiriye. Kurd hê jî tèn Ew-rûpayê. Sedemên vê yekê gelek in. Lê ya bingehîn politîkaya dewletê ye.

Dewlet jî bo vê yekê çî dibe? Dewletê bi xwe hin şebekeyên tarî organîze kiriye û bi taybetî cihên ku têkoşîna neteweyî bilind e; xort, jin û zorakan teşwîq dibe, ku ji Kurdistanê herin. Helbet tedbirên dewletê tenê ne teşwîq in. Ji bo Kurd dev jî welêt berdin, dewlet gundan dişewitîne, bajaran bombebaran dibe, agir berdide daristanan, heywanan dikuje. Dewletê bi rêxistinên xwe yê legal û îllegal, di nava salêkê de nêzîkî 500 kesên welatparêz û rewşenbîr jî bo vê yekê kuştîye. Îro li Kurdistanê her Kurdê ku, ne bi dewletê re ye, hedefa terora kontgerîla, hizb-î


kontra û hwd ne. Gelek mixabin nîfûsa hin bajar û bajarokan nîve nîv ketiye. Felaketa herî mezin jî bo Kurdan, îro jî Kurdistanê barkirin e. Ev bûyer jî sistema parêzgerên gundan jî xirabtir e. Dewlet dixwaze bi vê terore hejmarê Kurdan li Kurdistanê kêmtir bike û bi wî awayê pîrsa Kurdistanê, di platformên navneteweyî de bike pîrsa "terorîstan".

Îcar hin Kurdên ku li Ew-rûpa ne bê ku bala xwe bidin vê politîkayê; mirov, dost û hevalokên xwe dikîşînin Ew-rûpayê. Heger alîkariya Kurdên Ew-rûpayê tune be, ne ji aliyê aborî û ne ji aliyê teknîk ve, ne mumkun e ku, Kurd bikaribin werin. Îro hatina kesekî dike 10-15 hezar dolarî. Muşteriyên şebekeyên tarî Kurdên Ew-rûpayê ne. Pîrê caran ev kes mafê rûniştandinê jî li Ew-rûpayê nagirin û perîşan dibin. Divê bê zanîna politîkaya hemû welatên Ew-rûpayê jî, li hember penaberan guheriye. Kîza aborî ya Ew-rûpayê nema tehamula biyaniyan dike. Mirovhezî û demokratiya dewletên Ew-rûpa jî girêdayî berjewendiyên monopolên Ew-rûpayê ye. Ji bo monopolan, biyanî îro bela ne, şertên penaberên nûhatî te de ne, jî hepişxaneyan pîrê çêtir nîn in. Îşkenceyên fizîkî tune ne. Lê, bi nan û zîk 2-3 sal di xaniyekê ku pîrê caran jî bajarên mezin dîr e, mecbûr e bîmîne. Pîrî penaberan di van 2-3 salan de dibin xwedî gelek nexweşiyên dijwar. Ji bo vê yekê, yê mirovê xwe jî welêt dikîşînin pîrê caran jî şexsê wan re jî başî nakin.

Çumku rewşa me bi van rojên dawî jî başûrê Kurdistanê bi sedan kesên Kurd xwe bi keştiyên masivanan gihandibû qeraxên Swêdê. Paşê grûbekî din, grûbekî din... Çapemeniya Swêdê behsa penaberên Kurd dikir. Bi milyonekî dolar, qasî sed kesî xwe ji Rusyayê gihandibû Swêdê. Bi vê şeweyê jî welatê xwe revîn me Kurdan dişikîne. Rêz û hurmeta gelên din li hember me kêmtir dibe. Lê zanîna beşekê jî başûrê welatê me, rizgar bûye.

ENCAM

Terkkirîna welêt problemên Kurdistanê çareser nake û birîna me hin jî xedar dibe. Îro li cihanê her roj dewletekî nû tê damezirandin. Problemên civakî û siyasî bi tedbir û riyên siyasî hel dibin. Em Kurd jî mecbûr in xwe wekî xelkê bibînin. Em divê heta, heta muhacirî jî xwe re layîq nebînin. Hebûna pîrsa Kurdistanê di rizgar û azadbûna Kurdistanê de ye. Têkoşîna gerîla rîya azadî û serxwebûnê vedike. Tîştê ku layîqê me ye, welatekî azad û serbixwe ye. Têkoşîna Kurdan jî bo welatekî azad û serbixwe di tu demê dirokê de, hewqasî bilind nebûye. Dinya tu carî jî pîrsa Kurdan re, bi vê dereceyê aşîna nebûye. Ji ber wê jî, îro şansê me jî her demê zêdetir e, ku em mafên xwe yê neteweyî û demokratîk bi dest xînin. Ji bo vê yekê jî, îro jî welêt derketinê, kes nikare jî aliyê moral, welatparêzî û Kurdbûnê ve îzeh bike.





Ma qetla hêviyê, ji qetla mirovan
ne diwartir e?

Eduardo Galeano

Şayiya jiyana meleyên Kurdistanê

Li Kurdistanê, nexşên herî bi rengin in me. Ne wek yê kesî ye jiyana wan. Ev elçiyên navbera dinya û axretê, bi berçavkeke hûrtinazî li dinyayê dinihêrin. Di destpêka axaftina her bûyereke de, qala bûyereke din dikin ji we re.

Ji wan meleyan çend kes, ji bo îmthana diyanetê hatin Enqerê. Meleyên Kurd, malên ku lê mane şa kirine. Piştî mêvandariya du rojan, bîranînên gelek xweş hiştine li dû xwe...

"Mele dibê elîf û bê." Kurd pirrî caran bi van gotinan meleyan bi birînin. Di vir de, girîngiya peyvê, di "bê" ya cotmanê de ye. "Bê" hem tîpa duyemîn a alfêbeya Erebi ye, hem jî, bi Kurdî, di maneya "were" de ye.

Mele dibêjin elîf û bê. Yanî piştî ku tîpa yekemîn dixwînin, dibêjin "hema bila bê." Ev gotin, ji bo diyarkirina jiyana meleyan a hazir û bêwestan, pirr tê bikaranîn. Tiralbûna wan û bêyî ku bixebitin li ser haziriyê danîna wan, bi vê gotinê tê diyarkirin.

Jiyana bi hev re, yê di medresayan de, zanyariyêke dewlemend daye wan. Dema qala meseleyekê, an mijarekê tê kirin, di wê keliyê de, meseleyêke pê ve girêdayî, bi hûrtinazî dibêjin.

Heftiya borî, çend kes ji van meleyan, ji bo îmthananê diyanetê, hatin Enqerê. Meleyên Kurd, malên ku lê bûne mêvan, şên kirinc. Yek ji van meleyan lêzim (eqreba)ê malê bûye. Ên din ji gotine "mala xalo ye" û pê re hatine. Meleyên mêvan, piştî du rojan gelek bîranînên xweş li dû xwe hiştine û çûne.

Qerf û henek hê di nav derê malê de, dest pê kirine. Meleyek di devê salonê de, salona vala nişan dide û dipirse: "Hevalên te yên mê li ku ne?" Meleyê lêzim, bersiva wî bi mînakê dide: Hevalê wî jî, li hember wî vê çirokê dibêje.

"Li nêzikî gundekî, koçer konên xwe datînin. Yek ji xortên

gundê rijîmayî (abazan), pîrikeke koçer bi tenê diqefile û ji pişt ve xwe nêzî wê dike. Bi dengê bilind dibêje. "Pixk" û wê ditirsîne. Pîrika reben ji tirsê li erdê dikeve û xort ji radibe ser wê û...

Pîrikê pêşî lava dike û dibêje "meke", lê ber bi dawiyê ve li xweşiya wê jî tê.

Piştî bi demekê koçer ji dorhêla gund vediqetin. Sala din, ji nû ve tîna li dorhêla wî gundî kon datînin. Pîrika me jî di nav wan de. Kêfa pîrikê tê. Li der û dora xwe dinêre. Li pêş, çend xort dibîne. Lê xortê ku par êrişê ser kiriye nas nake. Ber bi xortan ve nêzikayî dide. Dest bi, "Pixk!

"Ezê bêhtir puan bistînim..."

Li ser vê jî, çirokê dibêje:

"Meleyek pîr, bi pîreka xwe ya ciwan re, li Diyarbekir diçe nexweşxaneyekê. Piştî muayenê, hemşîre jê pirs dike: "Mamo, ev pîrek bûka te ye?"

Ew jî bi lez bersiv dide: "Belê, bûka bavê min e." Û hemşîre jî, ferqa di bersiva mele de fêmanake. Mele jî, bi vî awayî xwe ji bersivandina "zewaca bi pîrekeka di emrê keça xwe de" rizgar dike.

Li mala ku lê ne, zila derî lê dikeve. Xwediyê malê ye, ya ku li derî dixê. Tiştêkî dipirse û diçe. Lê mele bi dengê pîrekê hesiyane.


Ki ye, çi ye dipirsin? Yek ji wan dibêje: "Xwezî bihata hundir" Yekî din jî qala serpehatiya xwe ya di dema feqîtiyê de dike:

"Ji ber ku zivistan bû, em hemû di odeyên dirêj ku min jê re digot hucre de diman. Em zêdeyî bîst xortî bûn. Derî, hema wilo nivco vebû. Jinika gewende (mirtib) û keçika xwe ne. Jinika gewende (mirtib) dema çav bi me ket, hema kir

qêrîn û got: "Bavoo, em li çala kîran qelibin" û bi milê keça xwe girt, revî revî ji hucre dût bûn." Ger niha xwediyê mala xalo bihata û me li hundir bidîta, dê ew jî bigota: "Bavoo ez li çala kîran qelibim".

Mele, bi pêşekiya, yekî ku baş bi Enqerê dizane, derketine gerê. Yek ji wan dike qêrîn: "Xoce, xoce." Yên din bi meraq lê vedigerin. Ê ku kiriye qêrîn: "Tu Xwedê, hele werin, hele werin." "Ên din hatine û nihêrine. Çi bibînin baş e? Di quncikekî de, jinekeke parsek piştîxûz û bi pertalên parçe parçe rûniştîye û bi dengêkî nizim "Ji bo Xwedê se-deqekê" dibêje û parsê dike. Meleyê ku bangî hevalên xwe kiriye, vê jinika parsek nişan dide û dibêje: "Qurbana Xwedê me, ha em somurgeyê (mêtîngeha) vê ya ne."

Ali MANAZ



Peywirdarên olî "Mele" îlhama hûrtinaziya jiyane ne. Xasûkiyên (qurnaziyên) biçûk, eroîzîzm qaideyên jiyane tev, di zimanên wan de, dibin henek û tinazên balkêş.

pixk" ê dike. Dema ku deng ji kesî dernakeve, dibêje: "Pixpîxîkê sala par! Pixpîxîkê sala par!"

Meleyê ku vê çirokê ji me re got, li hevalê xwe vedigere û dibêje: "Tu jî niha li hevalên mê" dipirsî, lê birastî tu jî dibêji pixk pixk!"

Êvarê li mêvanan çay tê belavkirin. Yek ji meleyan li stikanan (qedehan) dinêre. Xwediyê malê fêmanake. "Dibêje ev weke stikanên Diyarbekirê mezin nînin in." Bersiva mele wîha ye: "Mirov dibêje qey ev stikanên te hê nû ji dayika xwe bûne."

Piştî îmthananê bi hev henekan dikin.... Ki bersiva çend pirsan daye, guftûgo dikin û dihesibînin. Piştî hesabkirinê yek ji wan, xwe serkeftî dibîne. Lê di rastiya xwe de, di îmthana par de, bersiva pirrtir pirsan daye. Lê dişa jî xwe serkeftî dibîne û dibêje,

TÎR

Musa Anter



Bavê kal Musa Anter

Li ba me Kurdan, dema jinek tiştêkî baş bike, yan gotineke rast bêje, pesnê wê didin û dibêjin: Ev jina dayîkeke pîr e. Û dema peyak jî karekî baş bike, yan gotineke durust bêje, pesnê wî jî didin û dibêjin: Ew mêrê bavekî kal e. Ma gelo ne hêja ye ku em bibêjin Musa Anter bavekî kal e.

Bavên kal ên Kurdan pîr in, yek ji wan jî Musa Anterê canemerg (şehîd) bû. Bavê kal striyê çavê Tirko bû; kevîrê ser dilê wî bû. Bi gotinên xwe yên rast û şîrîn, bi nîvîsarên xwe yên rexnegirî dilê mirovên Kurd hênik dikir, kêla Tirko cih pênuşa wî birînen bavên kalên Kurdan ên koçbarkirî dikewandin.

Her cara ku hejmareke nû ya Welat dikete destê min, berî her tiştî min digote xwe: "Ez binêrim Melekê Tawûs çi şîret li me kirine." Şîretên wî li kêfa Tirko nedihatî. Bavê kal pîr pesnê camêriya Kurdan û rovîtiya dijminan dikir. Rovî jî şêrê me ditirsîyan.

Bavê kal, Melekê Tawûs!

Ne tenê Tirko ditirsînin, hinek Kurdên me jî tirsonek in. Guh bidin, tirsonekên me bê çi modêl in. Serokatiya Başûr tim û tim xinizên gelê me bûne, azadîfiroş in, serxwebûn firoş in... Em bûyerên kîjan salê bînin bîra xwe? Serokatiya Başûr ev çendî û çend sal in tim peyayê dijminan

bûne, çi mala Berzanî, çi mala Telabanî. Çiqas aşbetal di ser Kurdan re derbas kirine? Îro ji peyatiya Farisan têr bûne, berê xwe dane peyatiya Tirko û kirivê wî, Amerîka, şerê perçê Bakur dikin. Ew jî, ji berjewendiyên xwe yên şexsî ditirsînin, gelê Kurd çi pê were, xema wan nîn e.

Kî bawer dike ku parek ji gel bi dijminan re bigre û şerê para mayîna bike? Lê ew ji hikûmeta Başûr tê bawerkirin. Ji aliyekî de, Tirko; ji aliyê dinê de, xiniz. Herdu jî bi hev re êrişên çekdar dibîne ser ARGK. Serokatiya Başûr dikare bi paşayê xwe, Sedam Husên re li hev were û nekeve riya têkoşîna azadî û serxwebûnê li Bakur. Tirko hin mafên ku Sedam Husên dane wan nade aliyê Bakur. Eger ev ne dijmintiya gelê Kurd e, lê çi ye?

Çima parek ji Kurdên me piştigiriya hikûmeta Başûr li dijî PKK'ê dikin? Ev pare jî tirsonek in. Tirsonek ew kesên ku li dijî gelê xwe bi dijminan re digrin e. Îro, çiqas xinizî, xwefiroşî, pîsî û nokeriya serokatiya Başûr hebû, vê parê jî, ji birî kirin. Şûjinên ku di çavên serokatiya Başûr de hebûn û hene ji birî kirin, bi derziyên çavên ARGK girtin. Ev jî, ji ber ku tirsonek in, peyayên xelkê ne, ditirsînin berjewendiyên xwe bi Amerîka re xirab bikin.

Bavê kal, ka em giliyên xwe kûrtir ji hev re bibêjin. Gelo azadîfiroşiya serokatiya Başûr û azadîxwaziya ARGK bi hev re tê pîvan? Dînek jî wisa nake. ARGK azadî ye, serxwebûn e, rûmet e. Buhayê van tiştan giran in, te ew da, lê her kes nikare vî buhayî bidê. Te go çi?

Zina Şikakî

Kurdistan dinale

Dewleta Tirk, bi hemû hêzên xwe ve, li Kurdistanê di qirkirin û talankirineke hov de ye. Bi êrişên leşker û cerdevanan, di carekê de, bi dehan kes têne kuştin û birîndar dibin. Bi balefiran, gundên çiya hildiweşinin. Rê dibirrin, rêwiyan dikujin. Di vê heftiyê de, bi êrişên bi vî rengî nêzikî 30 kesî hatin kuştin.

Ne tenê bi çekan, lê bi gelek metodên din jî, qetliama xwe didomînin. 49 gundên Kurdistanê, îro di bin talûka birçîbûnê de ne. Dewlet nahêle ku xwarin bikeve gundên Eruh û Şirnexê. Armanca ambargoyê; valakirina gundên Kurdistanê ye. Ji bo vê, van metodên li dijî mirovahiyê bi kar tîne.

Navenda Nûçeyan- Li Midyad û Cizîrê kontra 14 mirov kuştin û 11 kes jî, birîndar kirin. Li Pasûrê, li gundê Gomag 5 gundî ji ber bombebarandina balefirên Tirk mirin.

Li Midyadê li gundê Çayirli, mînbûsa gund ji alî kontrayan ve hate gullebarankirin, 7 kes hatin kuştin û 11 kes jî, hatin birîndarkirin. Bûyer di 13.1.1993'an de qewimî. Kesên ku hatin kuştin navên wan ev in: Aydın Aydın, Azîz Kalayci, Halîl Dede, Gevriye Durmaz, Nuriye Kayar, Yusuf Bozbakir û Îsa Koç.

Li ser qetilkirina gundî yên Asûrî, Federasyona Asûra li Holandayê nameyêke vekirî ji bo serokkomar û serokwezîrê Tirkiyê re şandin. Di nameyê de rayedarên Tirkiyê ji bûyerê berpirsiyar tên girtin û qetilkirina gundî yên Asûr tê protestokirin.

Li mezraya Xerabreşkê ya gundê Cibrî ya navçeya Cizîrê jî dudo jê zarok 5 kes ji alî kontrayan ve hatin kuştin. Bûyer di saet 20.30 an de, di



Qetliam û cînayef îro bûne rastiyên Kurdistanê. Di wênê de gundiyên Xirabreşkê (Cizîrê) xuya dibin...

12.1.1993 an de qewimî.

Kontra cerdî ser mala Davut Ergün dikin, derketina wî ya derve dixwazin. Li ser bersiva ku Davut Ergün ne li malê ye re, kontra şênîyê

malê jî hundir derdixin û jin û zarokên wî dikujin. Ên ku bi gullebarankirina kontrayan tên kuştin Hasîbe Ergün (40), Lokman Ergün (20), Hidir Ergün (17), Nezîr Er-

gün (8) û Hacer Ergün (6), in.

Davut Ergün bi hinceta ku bi PKK'ê re alîkariyê kiriye hatibû girtin. Nêzikî salekê heye ku hatibû berdan.

Du gundiyên ku di 10. 1. 1993 an de ji gundê Misûrê ji hêla 120 kesan ve hatibûn revandin, cendekên wan li Newala Îsaaxa hate dîtin.

Herdu gundî Emîn Sevgat û Tahîr Koç bi hinceta ku alîkariyê bi PKK'ê re kiribûn ji alî hêzên dewletê ve hatibûn girtin û demek di girtîxaneyê de mabûn.

Balefirên Komara Tirk di 13.1.1993 an de, gundê Gomagê bombebaran kirin, 5 gundî ji ber bombebarankirinê hatin kuştin.

Çiyayê Kasor tevî gundên li dora xwe di binê bombebarandina balefirên dewletê de ne. Çiyayê Kasor dikeve navbera Pasûr, Licê û Darahênê.

Li gor çavkanî û ajansên fermî (resmî) yên Komara Tirk operasyon ji bo îmhakirina bargêh û qampên PKK'ê ne.

Li navçeya Hênê ya Amedê, kontra êrişî ser malekê, kirin. Di dawiya êrişê de Esma Eva (85), Sabîha Eva (55) mirin û Îzzetîn Eva û Leyla Eva jî birîndar bûn.

30 hezar kes di bin talûkeya birçîbûnê de!

Navenda Nûçeyan- Li Kurdistanê, ji ber ambargoya dewletê 30 hezar gundiyên 49 gundan ji sersalê û bi vir ve, di bin talûka birçîbûnê de ne. Li Sêrtê hêzên dewletê ev du meh in, li ser gundên Duhê yên Awal, Nît, Bîkat, Serxetê, Hesînka, Şîşîl, Bîlcûna û gundên Şirnexê yên Dêrşewê, Qernê, Erê, Basret, Şerifiye, Meydîn, Deştalela, Biyave, Aşilmê û Berêmirê ambargoya xwarinê bi kar tînin. Ev ambargo ji sersalê û bi vir ve bi awayekî dijwar dom dike. Hêzên dewletê destûra xwarinbirina van gundan nade. Û qût û xwa-

rinên ku gundî dixwazin bi bin jî, ji alî leşkeran ve ji bo qereqolên xwe tên standin.

Ji alî din ev ambargo, ji sersalê û vir ve li navçeya Şirnexê, li Basayê û li gundên wê jî tê bikaranîn. Ev gund jî ev in: Bucaxa Findiqê, Sewêdî, Xara, Nêwiya û mezrayên; Geliyê Osman, Şikeftiya, Goyina Kêrxwer, Zivinga Şikaka, Zivinga Hacielya, Hîrariş, Xursê, Bizêna, Xêste, Taruniye, Gêrê Bênat, Bunîsra, Şkeftêspî, Kehnihêjir, Şehrika Şewê, Dilopkê, Bana, Hêtma, Cêleka, Keraşa û Finik. Ji bo çûyîn û hatinê cihêkî van gundan tenê he-

ye, ev rê jî riya Sêrtê û Basayê ye. Û ev rê di ber qereqola jendirmeya gundê Çêlik de derbas dibe. Ew xwarin û pêdiviyên gundiyan ên ku heta sersalê gundiyan di vê rê de dianîn, ji sersalê û vir ve, ji alî ve qereqolê hatiye qedexekirin. Gundi xwarinên ku ji Kerboranê dianîn demekê li nêzikî gundê Taruniyê di çemê Dicleyê de bi kelehan derbas kirin. Lê piştî leşkeran vê riyê dîtin, çûyîn û hatina vê riyê jî qedexekirin.

Ji ber van sedeman xelkê van 49 gundan di bin talûka birçîbûnê de ne.

Sedam ji Kurdan naqere

Leşkerên Sedam, êvara 15'ê Çileyê, bi ser gundekî Kurd ve girtin û 3 pêşmerge birîndar kirin. Leşkerên Sedam, 6 gundiyên Kurd jî, bi xwe re birin. Parlamentoya Kurdistana Başûr, êrişa ser gundê Museka protesto kir. Wekî din jî, Sedam Huseyîn şikayetê Neteweyên Yekbûyî kirin.

Sedam Huseyîn, di van demên dawî de, ji nû ve dest bi hovîtiyên xwe dike. Ev dîktatorê devbixwîn, di her fersendî de, êrişî ser Kurdan dike û wan dike. Ev êrişa dawî jî, nişan dide ku Sedam darsa xwe negirtiye û ji bo qirkirinên nû li dû fersandeyan digere.

Bûyera Cinebiriyan li Strasbourgê

Komîsyona Mafê Mirovan a Ewropa mureceata gundiyan Cinebirê (Yeşilyurt) ya navçeya Cizîrê qebûl kir. Daweya Cinebiriyan bi danişîna (duruşma) yekemîn li bajarê Strasbourgê ya Fransa dest pê kir.

Dawe di 12.1.1993'an de bi beşdarbûna wekilê gundiyan Cinebirê Ebûqat Hasîp Kaplan, li ser navê hikûmeta Tirk rayedarên Wezaretê Karê Derveyî Muncî Özmen û Deniz Akçay dest pê kir û seredana gundiyan a yekane pejirand.

Weke ku tê zanîn serbazê Tirk Cafer Tayyar Çağlayan bi leşkerê xwe ve di 15 Çile 1989'an de girtibû ser gundê Cinebirê, îşkence bi wan kiribû û bi gundiyan gû dabû xwarin.

Li Tirkiyê dawe hatibû vekirin lê "Waliyê Herême" ew parastibû û di dawiya mehkemekirina wî de Cafer Tayyar Çağlayan 10 meh ceza standibû û cezayê ku standibû qelabtibûn milyon û niv perê Tirk.

Gündem wê ji nû ve bê lê bi hêztir

Navenda Nûçeyan- Rojnameya rojane Özgür Gündem navber da jiyana xwe ya weşanê ya heşt mehan. Rojnameya Özgür Gündem sedemê rawestandina weşanê ku ji bo demeke kin e, bi siyaseta dewletê ve dide girêdanê.

Rojnameya Özgür Gündem, di hejmarê xwe ya 15 Çile 1993'an de bi manşeta "Em dê hev ji nû ve bibînin" sedemê rawestandina xwe ya weşanê diyar kir.

Xwediyê rojnameya Özgür Gündem ê bi îmtiyaz Yaşar Kaya di nivîsa xwe ya bi navê "Ji xwendevan re, ji dost û dijminan re" de li ser biryara rawestandina weşanê disekine. Yaşar Kaya di nivîsa xwe de, li ser pest û pêkutiyê hêzên dewletê, polîs, kontra, çapemeniya Babê Alî, li ser astengî û dijwariyên ku derxistine pêşya wan, li ser kuştina rojnamevanan, rawestandina belavkirina rojnameyê û li ser ambargoya aborî ku dewletê derxistiyê pêşberî wan radiweste.

Yaşar Kaya bi berdewamî, "Gündem ji destpêka waşandinê ku nêzikî heşt mehan e, peywîrên gelek bi xawen (bi şeref) pêk anî, ev nayê inkarkirin. Mirovahiya ku li erdê dihate kişandin, li rûyê dijminê mirovahiye xist. Li Tirkîyê û li dinyayê bi şeref û xawen xwe da peyvandin. Bû dengê gelê Kurd û Tirk ê demokrat û şoreşger ku qet nayê jibîrkirin. Têkoşîna demokrasî û mafê mirovan da. Mînakîya çapemeniya şoreşger danî rastê. Vê yekê ne em ne ji dostên me ji bir nakin.

Vê hejmarê me ya ku tê waşandin dê nebe hejmarê dawî. Piştî demeke kin bi şûn ve bi dengê gurr, bi derfet û îmkane xwe yê mezin, bi organîzekirineke nû û bi awakirineke nû em dê derkevin pêşberê we. Û dê bigihîje destê we xwendevanan. Ji vê re şik û guman nîn e.

Rojnameya rojane Özgür Gündem ji gava destpêkirina jiyana weşanî ta roja ku navber da weşandina xwe, gelek dijwarî, astengî gelş û gelmeşyên siyasî, hiqûqî, aborî, belavkirina rojnameyê kuştina rojnamevanan, gullebarankirina erebeyên ku rojnameyê belav dikirin, şewitandina bufeyên bayîyan, kuştin û lêdana bayîyan berhevkerina rojnameyê ji hêla hêzên dewletê yê daraziyê (mehkemekirinê) ve û gelek tiştên din dit û ji jiyana we ev kêr nebin.

Rojnameger Hafîz Akdemîr (27) ku li buroya Gündemê ya Amedê dinihêrt, di destpêka weşandinê ya heftiya pêşin de, di 8'ê Hezîrana 1992'an de li ser rîya karê xwe hate kuştin.

Yeniden yapılmaya ihtiyacı nedeniyle Gündem yayınına bugüne kadar en kısa bir süre ara veriyor

Yeniden buluşacağız

Okurlara, Dostlara ve Düşmanlara

Yaşar Kaya

Elveda! Merhaba!

Halkı Gerçeğe

Gündem

Yakında yine birlikteyiz

Güç biriktirme evresindeyiz

Günün Gündemi

Basın Komitesi, basına dışardan erişimi kapatmıştı

Gündem

15 Ocak 1993 Çarşamba

"Emê ji nû ve hev bibînin" Özgür Gündem 15 Çile 1993.

Nûçeyanê Gündemê yê navçeya Kercewê ya Batmanê, di 31 Tîrmeh 1992'an de li ser rîya mala xwe ji paşve hate gullebarankirin. Nûçeyanê buroya Amedê Burhan Karadenîz di 5'ê Tebaxa 1992'an de hate gullebarankirin. Niha felc e. Û jiyana wî bi sendeliya bi tekelek ve girêdayî ye.

Nivîskarê rojnameya Welat û Gündemê endamê PEN'a navneteweyî Huseyîn Deniz, di 9'ê Tebaxa 1992'an de li Serêkaniyê navçeya Ruhayê hate kuştin.

Rojnameger, nivîskar ji damezrenêrên HEP'ê nivîskarê rojnameya Welat, Yeni Ülke û Gündemê Musa Anter di 20'ê Îlona 1992'an de li bajarê Amedê hate kuştin. Musa Anter beşdarî Festîwala Huner û Çandê bûbû ku ji hêla Beledîya Diyarbekir ve hatibû amadekirin.

Di 24'ê Mijdarê de li Amedê nûçeyan Mehmet Şenol û amirê îdarê yê buroya rojnameyê Amedê Hasan Özgün, dema ku rojnameyê bi derfet û îmkane xwe belav dikin ji paşve tînan gullebarankirin. Hasan Özgün ji qorika xwe bi sivikî birîndar dibe, erebeyê Gündemê xesar dibîne û Mehmet Şenol rojekê di bin çav de dimîne.

Piştî ku şirketa belavkirinê li Kurdistanê dev ji belavkirinê berdide, Gündem bi derfetên xwe, rojnameyê belav dîke. Û vêca "hêzên tarî" bi ser belavkarên rojnameyê, bayiyên rojnameyan ve tînan.

Halîl Adanîr li Batmanê di 23'ê Mijdara 1992'an de navrojê tevî erebeyê xwe tê şewitandin. Sucê Halîl Adanîr tenê belavkarekî rojnameya Gündemê yê dildar e.

Bayiyê rojnameyan Kemal Ekinçî (35) di 16'ê Kanûna 1992'an de li Amedê hate kuştin, di 16'ê Kanûna 1992'an de li Amedê bayî Çoşkun Daloglu (Doşo-60) hat birîndarkirin.

Li Wanê bufeya 4 bayîyan, li Amedê bufeya 2 bayîyan li Ruhayê bufeya bayîyan û Çepêkçûrê (Bingol) bufeya 2 bayîyan li Mezrayê (Elezîz) bufeyek û li Şemrexê (Mazîdaxî) 1 ji bufeya

bayiyek hatin bombekirin û şewitandin.

Li Nisêbinê firoşkarê rojnameya Gündemê Lokman Gündüz (20) di 1'ê Kanûna 1992'an de hate kuştin.

Xebatkar û nûçeyanê rojnameyê jî, ji pest, tahde û geflêxwarinê dûr neman. hem xebatkar û nûçeyanê Gündemê yê li navenda rojnameyê û hem jî yê li buroyên wê. Nûçeyan hatin girtin, makîneyên wan hatin şikandin, dest li ser flimên wan hate danîn.

Li ser peywîrên xwe nûçeyanê aboriyê Kazim Erdoğan, nûçeyanê Mêrdînê Ahmet Dağ li wan hat xistin. 28 xebatkarên rojnameyê tevî hev 203 roj girtî man. Ji vanan Halîl Yalçın û Şaban Parlak 8 meh raketî man.

Di 12'ê Tîrmeha 1992'an de peywîrdarên rojnameyê ku qalîbên rojnameyê dibirin çapxanê jî alî tîman ve li wan hate xistin. Ên ku ji hêla tîman ve lêdan xwarin Gökhan Kürüm û Cafer Yıldız bû.

39 hejmarê rojnameya Gündemê hate berhevkerin. Ji bo xwediyê rojnameyê yê bi îmtiyaz Yaşar Kaya 187 milyar 538 milyon cezayê pere, ji bo Berpirsiyarê Nivîsarî re Selçuk Gür 12 sal cezayê girtinê û 71 milyar cezayê pere, di 16'ê Kanûna 1992'an de Mudurê Berpirsiyarê Nivîsarî Işık Yurtçu 43 sal heps û 23 milyar cezayê pere tê xwestin.

Ne failên qatîlên rojnamevanan hatin girtin û ne jî failên bûyerên kuştin û şewitandina bufeyên bayîyan. Bi ser de jî rayedarên Komara Tirk di daxuyaniyên xwe de rojnamevanên ku hatine kuştin, mîna rojnamevan qebûl nekirin. Ew rojnamevanên kuştî mîna millîtan ji hêla rayedaran ve hatin bi navkirin. Heta kuştina rojnamevanan mîna "ji hev hesap pirsînekê" nixandin.

Rojname di jiyana xwe ya 228 hejmarî de li hember hemû astengî û dijwariyan li ber xwe da. Lê piştî rêlibergirtina belavkirina rojnameyê, tîraj gelek ber bi jêr ve daşiqitî. Pirs-girêkên aborî bû sedem ku Gündem navber bide weşana xwe.

Meclîs û amadekirina qanûnê bingehîn

Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê, dest bi xebatên xwe yê amadekirina qanûnê bingehîn û destûrnameya hundirîn, kirin. 15 mebûsên Meclîsa Neteweyî û nûnerên gel, li Almanyayê, bajarê Bonn'ê, ji bo çapemeniyê civinekê pêk anîn. Mebûsên Meclîsa Neteweyî û nûnerên gel, di vî civinê de, amadekariyên xwe diyar kirin. Li gor beyanên wan, amadekariyên Qanûnê Bingehîn (Anayasa) û ji bo xebatên meclîsê, destûrnameya hundirîn (iç tüzük) dest pê kirine.

Mebûsên Meclîsa Neteweyî, di civinê de, li ser pîrsa "Çima Meclîsa Neteweyî" jî sekinîn û wiha gotin: "Dê Meclîsa Neteweyî vîna (îrade) gel pêk bîne û di qada navneteweyî de, bibe nûnerê gel ê meşrû. Êdî dê ji bilî meclîsê tu hêz, nikaribin der mafê qedera gelê Kurd de, bibin xwedî gotin û biryar.

Gelê me, bi awakirina vî meclîsê, gihîştê wê hêzê ku doza xwe bi hêztir biparêze. Avabûna meclîsê, ji bo yekbûna her çar parçeyî gavê herî mezin e.

Di nava 2 mehan de 50 gund vala bûn

Bi destpêkirina "tevgera hundirîn" re 50 gund ji binî ve hatin valakirin. Şênîyên gundên ku hêzên dewletê ew vala kirine bi pirranî li bajarê Amedê bi cih dibin. Di nava du mehan de nifusa bajarê Amedê du qat zêde bû.

Gundên ku hatine valakirin ên navçeyên Amedê, Pîran, Farqîn, Pasûr, Licê, Hênê, Erxenê, hin navçeyên Şîrnexê, navçeyên Mêrdînê Mesert û Şemrexê ne.

Serokê Baroya Amedê Fethî Gümüş da xuyan ku gelek kes serî li baroyê dixin û ji hêzên dewletê gazin û giliyên xwe dikin. Fethî Gümüş got ku: "Dozger û dadger bi hinceta ku garantiya canê wan nîn e naçin li cih tespîta xesar û ziyana gundiyan nakin."

Radyoya 'Dengê Kurdistanana Serbixwe'

Radyoya 'Dengê Kurdistanana Serbixwe' dest bi weşanên xwe kir. Li gor ajansa Kurd-Ha, ev radyo ji bo ku bikaribe bûyeran û xeberan di cih de, bi bêderengî bigihîjîne gel û politikayên îmhakirinê ku li Kurdistanê tînan meşandin bînan teşhîrkirin û gel ji têkoşinê bi awayekî rast bê agahdarkirin damezirîye. Radyo wê her roj li navbera saetên sibê 09.00-10.00 an de weşanên xwe bike. Weyanê radyoyê wê bi Tirkî, Kurmancî û Soranî, bin. Piştî nivro wê ji 15.00 an heta 16.00 tenê bi Tirkî û Soranî program bê weşandin.

Radyoya 'Dengê Kurdistanana Serbixwe' wê weşanên xwe ji ser 41 mm. pêla kin (kisa dalga) û ji 7000 KHZ'yê bike.

Gel li cenazeyên xwe xwedî derdikeve

Gelê Kurd, cendekên zarokên xwe li ser erdê nahêle û li wan xwedî derdikeve.


Hêzên dewletê, cenazeyên gerîlayên ku di şer de tînan kuştin, nade malbatên wan û bi metodên li dijî mirovahiye, an davêje çol û pesaran an jî, ji malbatên wan bi dizî vedîşere.

Veysî Arzulu, gerîlayekî ARGK'ê bû, ku di Sibata 1992 an de, di şerê bi hêzên dewletê re de hatibû kuştin û cenazeyê wî li Mazra (Elezîz)'yê, veşartibûn. Lê malbat û gundiyan wî, cenazeyê wî li wir nehiştin û anîn li gundê wî Xirbizilê ku girêdayiyê Çinarê ye, veşartin.

Roja ku cenazê Veysî Arzulu ji Mazrayê anîn, esnafên Çinarê dikanên xwe girtin û protestoyeke girseyî pêk anîn.

Cenazeyê Veysî Arzulu, bi beşdariya 1000 kesî ve li Xirbizilê hate veşartin.

PÊNÛS



Amed Tigris

Çend hewcedariyên bingehîn

Bi taybetî îro em Kurd ji aliyê ziman, edebiyat û kulturê ve hewcedarê çend tiştên bingehîn in. Di nav van tiştan de yên girîng û acil hene. Mirov dikare van pêngavên girîng û acil rêz bike. Pêngava yekemîn bi cih hatiye ku ew jî **alfabe û gramera Kurdî** ye. Ev pêngav 40-50 sal berî niha, ji aliyê **Celadet Bedirxan** ve hatiye avêtin. Lê hezar mixabin ew jî di cihê xwe de maye.

Baş e, lê pêngavên din yên girîng çi ne ku ew heta niha nehatine avêtin?

Pêngavên din **rastnivîsîn, ferheng, ansîklopedî û atlasa Kurdî** ne. Ev kar gelek girîng e. Bingehê ziman û kulturê ne. Bê van çavkanî an materyalên zanîne kar û barên ronakbîrî qet nameşe. Alfabe û gramera ser û gewdeyê ziman û edebiyatê

Pêngavên din rastnivîsîn, ferhenge, ansîklopedî û atlasa Kurdî ne. Ev kar gelek girîng e. Bingehê ziman û kulturê ne. Bê van çavkanî an materyalên zanîne kar û barên ronakbîrî qet nameşe. Alfabe û gramera ser û gewdeyê ziman û edebiyatê ne. Rastnivîsîn, ferheng, ansîklopedî û atlas jî dest û lingê wê ne. Kesê bê dest û ling seqet e, hem jî seqetiyeke giran û dijwar... Ew nikare tiştêkî bike. Niha ser û laşê me heye, lê dest û ling tune ne. Ji me re, bi lez û bez dest û ling divên.

Hezar mixabin heta îro di warî de ne bi şexsî û ne jî bi kolektîvî kar nehatiye kirin. Jixwe şexs nikarin ji binê vî karê giran derbikevin jî. Ev karekî giran, dûr û dirêj e. Karekî kolektîvî ye. Karekî akademîkî û zanistî ye. Bi rastî û kurtî ev kar, dikeve ser milên akademî û enstîtuyên Kurdî.

Çi li Ewrûpa, çi li metropol û çi li hundirê welêt ew akademî û enstîtuyên Kurd û Kurdiyên ku heta îro hatine damezirandin bi kar û barên wiha re qet mijûl nebûne û nabin. Ew li ser proje û planên wiha qet nafikirin û lê hûr nabin. Ew bi xwe polîtîka dikin. Hem jî xwe dikin navenda (merkeza) polîtîkayê. Di vî warî de Enstîtuya Parîsê minaka herî berbiçav (konkret) e. Ew enstîtuyeye firoke ye. Li hewa ye, ne li erdê ye. Enstîtu her civîneke xwe li paytextê welatekî Ewrûpa çêdike. Herwiha di salekê de li hemû paytextên Ewrûpa digerin. Pîrraniya wexta berpirsiyar û endamên wan di balefiran de derbas dibe ku êdî ew fersend û îman nabînin ku weşana xwe ya merkezî jî derbixin. Wiha xuya ye ku enstîtuya Stenbolê jî, xwe kiriye bin erdê.


Karê ziman, edebî û kulturî bi xwe jî siyaseta e. Bi taybetî ji bo me Kurdan. Ji ber ku karê kulturî û edebî direkt an jî îndirekt alîkariya rêxistin û partiyên pêşverû û niştimanperwer dike. Problemên ziman, edebiyat û kultura Kurdî li ser riyên parî û rêxistinên Kurdan asteng û kospan çêkirine û dikin. Ziman û edebiyata Kurdî her ku xurt dibe û li pêş dikeve, berê rê li xebata polîtîkî jî vedike. Hîsên neteweyî di nav xelkê de reh û kokên xwe berdidin erdê. Rê li pêş rêxistin û partiyên jî vedibe. Ew bi firehî û kûrahî dikevin nav xelkê.

Bi destxistina rastnivîsîn, ferheng, ansîklopedî û atlasa Kurdî êdî dê tû hêz û kes nikaribe ziman, edebiyat û kultura Kurdî winda û înkâr bike. Heger bi ser de jî klasîkên cihanê hatin wergerandin; tewê de wê çaxê ziman û edebiyata Kurdî li Rojhilata Navîn û cihanê gul vebide. Nav û deng bide.

Vekolanên li ser dengnasî û peyvsaziya dîrokî ya zimanê Kurdî û zaravayên wî

Prof. PIERRE LECOQ

Alîkarîkirin û wergerandina Mamo Cûmî



(3)

6) Tr(Hind- Ewrûpî) > Thr(Mêdî, Avistî) > Ç(Pari-siya Kevin) > S(Farisî):

Sanskirît (putre-), Avistî (pulhre-), Perth (pûr<puhr), Parisiya Kevin (puçe), Farisî (pus), Kurdî (pis). Sanskirît (kşetre-), Avistî (xşethre-), Parisiya Kevin (xşêçe-), Perth (şehr), Kurdî (şehr).

7) Ty (Hind- Ewrûpî) > Thy (Mêdî, Avistî) > Σiy (Pari-siya Kevin):

Sanskirît (setye-), Avistî (hethye-), Parisiya Kevin (heşiyê-), Kurdî (hebûn, rast). Mêdî (xşayethiye-), Kurdî (şah).

Qanûnê (1, 2, 4, 5) li Kurdî dikeve, a(3, 6, 7) ez nizanîm, divê mirov lê bigere. Bernavên nişnakî (î-me) û (eve) ên Mêdî li Kurdî dikevin, ne li Farisî. Di Farisî de (în) û (an) e. Bernavên kesane li dema Akêmênî li Farisî nakevin. Gotina Farisî (îmroz) û bernavê kesane (û) ji Perthî (Pehlewi) hatiye. Ji nav zimanê Îranî tenê Farisî jî hemûyan cîwaz e.

Serçavkên ku di destên me de hene têrî nakin ku em bibêjin Kurdî ji Mêdî hatiye, an nehatiye. Em dikarin bibêjin erê, lê hin zaravayên cînê yên Îranî jî, nêzîkî Mêdî dibin.

5) Zaravayên Îranî yên Rojava yên dinê:

A) Perthî: Ev zimanê tenha ye ku ji berî îslamê (Sedsalek berî Zayînî ta sedê III. paşya Zayînê) bi belge maye. Li Xurasanê (bi Perthî: roja hilatî) bi cih kirine. Di warê ziman-nasiyê de, Perthî nêzîkî şaxên Farisî dibe; lê di warê dengnasiyê de nêzîkî Mêdî dibe. Perthî winda

bû û kok, tiştêk li pey xwe nehişt.

B) Azerî (ji zaravayekî Îranî re tê gotin, ne Azeriya Tirkî ye, ew tiştêkî dinê ye) û Talêşî

Navên van zaravanan E.Kesrewî lê kirine; ev zarava li hin gundên ji Azerbaycana Tirkîaxêv dûr hatine dîtin, bi cih, li aliyê bakur li Dizmar û Herzendê; li aliyê rojhilatê, li Xelxal û Taromê û li aliyê başûr li herêma Qezwînê. Zaravayên Talêşî li dirêjahiya peravên derya Kaspîne, li Yekîtiya Sovyetê (Lenkoran) û li Îranê (Estara) ta Gilanê. Li Rojava, Tirkî û Azerî dora wan digirin. Zaravayên Azerî û Talêşî yekîtiyeke wan a zimanî heye, hemû gerek e ji yek zimanekî Îranî yê kon (Kevin) hatibin. Di warê erdnasiyê de, ev zaravayê dibe ji Mêdî ma bin (mîna çawa E.Varshater jî dibîne). Lê ev têrî nake.

C) Gilakî: Komek zaravan e, hinekî ji hev cuda ne, li Gilanê, Deylama Kevin, li peravên rojava yên Kaspîne, tê dengkirin.

D) Mezderanî: Li rojhilat, li ser xaka Hîrkaniya Kevin tê dengkirin; xwediyê tradîsyoneke wêjeyî ye, helbestvanekî mezin, Emîr Pazvarî, bi vî zimanî heye. Kevin jê re digotin "Gorganî, an Teberî, ji Teberistana Kevin".

E) Semnanî: Zimanê bajarê Semnan û çend gundên derdorê ne. Zimanekî deverî e, wêjeyekî nexirab pê tê nivîsandin.

F) Sorxî, Lazgerdî, Sengisarî û çendên dinê li hin gundên dûr li derdora Semnanê tene axaftin. Problemeke wan heye, he-

mû hinekî ji hev û ji Semnanî cuda ne. Ev zaravayên entîke (tiştê çawa Kurdî peyda dibe) ne, an ji Kevin de mane, an di demekê de hatine wê derê (wekî çawa Kurdî çûye Xorasanê) ku em hê nas nakin.

G) Zaravayên navendî: Ji zaravayên ku li derdora Esfehanê tene dengkirin re dibêjin; dora sî (30) zaravayî hene. Li bakur, devoka Kaşanê, Netenzê, Ebyanê, Tarê, hwd.; li rojava, a Mehelatê, Gulpayeganê, Xûnsarê, hwd.; li rojhilat a Ebû Zeyd Ebadê; li başûr, a Gezê, Sedehê, Nayînê, Erdestanê û ji wê dûrtir, zaravayê Zerdestiyên Yêzdî û Kermanê. Ev zarava yekîtiyeke wan a zimanî heye, em dikarin bibêjin koka wan tev ji yek zimanekî Kevin hatine. Xaka ku lê ne, cihê Kermana Kevin e.

Ev devokên jêrîn jî digihên zaravayên wekhev:

a) Devokên Tefrêşe (navça Sevê): Aştiyani, Vetsî, Kehekî, Vîdarî, hwd.. Ev zarava nêzîkî Azedî dibin; hinên wan kartêkirina Kurdî li ser hene.

b) Zaravayên Kevirê: Xurî, Fervî, Mehrjanî, hwd. Ev zarava jî digihên Beloçî û belkî digihên zaravayên Kevin ên Sîstanê jî.

c) Sîvendî: Tenê li Farsê maye, dora 12 kilometran li bakurê Şîrazê dikeve. Dibe koka vê devokê ji bakur be, an jî, ji zaravayê "navendî" be, li demekê hatiye vê derê ku em nikarin bibêjin. Li jêr di kartêkirina Lorî, Kurdî û belkî Goranî de maye (pirtika komê: -ger; Kurdiya Başûr "gel" binêrin; kor: law, hwd).

Wê bidome

Kulturrod an gevziglod

Gelo prensîb û pîvanên ew pisporên (ekspertên) beşa Kurdî an jî ya Kurdan çi ne ku alîkariyê nadin van pirtûkan? An jî didîne yên din? Naverok e? Politîka ye? Nivîskar in? Nivîskarên ku li Swêdê an li derî Swêdê dijîn in? Cureyên edebî û dîrokî ne? Werger e? Qalîteya çapê û mizampajê ye? Çapkirina li Swêdê û li derê Swêdê ye?

M. Xarpêtî

Li Swêdê bi navê Kulturrod dezgeheke (mueseseyeke) kulturê heye. Jixwe navê wê jî tê wê maneyê ku, alîkarî û piştgiriya parastin û pêşketina kulturî dike. Bi taybetî ev dezgeh alîkarî û parastina ziman, edebiyat û kultura biyaniyan (xerib û muhaciran) ku wek kes an jî civat li Swêdê dijîn dike. Di dezgeha Kulturrodê de beşa Kurdî jî heye. Çend kesên Kurd ji berê ve, wek hût serê coya ava vê Kulturrodê, ya beşa Kurdî girtine. Ew kes alîkariya Kulturrodê ya madî di nav xwe, heval û dostên xwe de belav dikin. Prensîb û pîvanên Kulturrodê ji navê rakirine. Bi awayekî eşkere Kulturrod ji xwe û der û dora xe re kirine tekiya ma-

la şêx. Bi gotineke din Kulturrod ji van kes û der û doran re bûye gevzigrod. Xwe tê de digevizînin, çawa?

Wiha wek minak, di van çend mehên dawî de, li Swêdê çend berhemên hêja hatin çapkirin. Weşanxaneya Rewşen pirtûka Îsmail Beşikçi ya "Kürt Aydını Üzerine Düşünceler" wergerand Kurdî. Bi Kurdî navê pirtûkê Çend gotin li ser ronakbîrên Kurd e. Pirtûk ji aliyê Amed Tîgrîs û J. Espar ve hatiye wergerandin. Hewce nîn e ku em Îsmail Beşikçi bi xwendevanên xwe bidin nasandin ku ew kî ye û çi dinivîse. Jixwe di navê pirtûka wî de jî diyar û zelal e ku li ser çi babetî hatiye nivîsin. Armanca weşanxanê ew e ku, ew Kurdên ku bi zimanê Tirkî nizanin û heta îro nikaribûne pirtûkên Îsmail Beşikçi bixwînin û tenê wî wek dostekî Kurd dinasin, qet nabe bi riya vê pirtûkê der heqê dîtinên Beşikçi de agahdar û serwest bibin.

Pirtûka Weşanxaneya Rewşen a duyemîn jî ya Şerexan Cizîrî ye. Pirtûk bi zimanê Tirkî ye û navê wê Kultur ve Uygarlık, Anadolu, Kürdistan, Mezopotamya (Li Anatol, Kurdistan û Mezopotamyayê Dîrok û Şaristanî) ye. Ev jî wek di navê wê de diyar e, li ser şaristaniya kevin a berî Îsa ye. Lêkolîneke baş e. Pirranî û giraniya pirtûkê li ser ziman, kultur, tîkiliyên sosyal û bîngeha şaristaniyê ye. Pirtûk 344 rûpel e û çap jî spehî ye. Ev herdu pirtûk jî bê sedem ji aliyê Kulturrod beşa Kurdî ve, layîqê alîkariya çapkirinê nehatine dîtin. Çima?


Du pirtûkên din jî hene ku ew jî, ji aliyê Weşanxaneya APEC ve hatine çapkirin. Rewşa wan herdu pirtûkan jî wek herduyên

jorîn in. Yanî layîqê alîkariyê nehatine dîtin. Pirtûka yekemîn a şêhidê nemir Necmettîn Büyükkaya ye, navê pirtûkê "Kalemimden Sayfalar" (Ji Pênûsa Min Çend Rûpel) e. Birayê Necmettîn Büyükkaya, Şerwan Büyükkaya piştî şêhidkirina Necmettîn gelek destnivîsar, name, meqale, pêkenîn, serpehatî û xebatên wî yên li ser gramer û rêziman, zaravayê Dimilî berhev û amade kiriye. Zimanê pirtûkê bi Kurdî û Tirkî ye. Kurdiya wê jî bi zaravayên Kurmancî û Dimilî (Zazakî) hatiye nivîsin. Bi ebata mezin pirtûk 504 rûpel e.

Pirtûka duyemîn a Weşanxaneya APEC, "Roj bi Roj Şerê Kendavê û Kurd" e. Ev pirtûk ji aliyê Amed Tîgrîs, Cemal Batun û Xorto ve hatiye nivîsin û amadekirin. Pirtûk, ji destpêka Şerê Kendavê (Xelîcê) heta şikestin û tîkçûna Sedam, serhildan û şikandina Kurdan, ji ber balefir û topên Sedam koçkirina Kurdan e. Şerê çiyayên Kurdistanê, hatina Hêzên Hevkar a Herêma Kurdistanê bi awayeke vekirî roj bi roj hatiye nivîsin...

Bi belge û meqaleyên nivîskarên pirtûk hatiye xemilandin. Ji pirtûkê beşeke biçûk di Berbangê de jî hatiye weşandin. Ev pirtûk dîroka Şerê Kendavê û ya Kurdan e. Dîroka salekê ye. Di warê dîrok û rojnamegeriya Kurdî de berhemeke wiha tune ye. Pirtûk bi fotograf û karîkaturên xwe ve 376 rûpel e. Çapa wê jî bi qalîte ye.

Gelo prensîb û pîvanên ew pisporên (ekspertên) beşa Kurdî an jî ya Kurdan çi ne ku alîkariyê nadin van pirtûkan? An jî didîne yên din? Naverok e? Politîka ye? Nivîskar in? Nivîskarên ku li Swêdê an li derî Swêdê



Pirtûka Îsmail Beşikçi, çend gotin li ser ronakbîrên Kurd jî, ji aliyê kulturrod beşa Kurdî ve layîqê alîkariya çapkirinê nehatine dîtin.

dijîn in? Cureyên edebî û dîrokî ne? Werger e? Qalîteya çapê û mizampajê ye? Çapkirina li Swêdê û li derê Swêdê ye? Alîkarî li gor zêdebûn û kêmbûna rûpelan e? An jî hevaltî û dostanî ye? Fortdayîn û pesndayîn e? Çi ye?

Divê ew kesên berpirsiyar, pispor (!) û xwedîbiryarên vê dezgeha Kulturrod bersiva van pirsan bidin. Û bersiva ew ber-

hemên xwe yên ku li Tirkiyê û welatên din çap dikin jî bidin. Divê ew kes, li listeya ew berhemên ku heta niha alîkariyê girtine carekê din binêrin û wan bi van berhemên ku me navên wan li jor nivîsin re muqayese bikin. Gelo Necmettîn Büyükkaya ji bo bîr û baweriya xwe şêhid neket? Kê pirtûkên Îsmail Beşikçi qedexe dike û nahêlin ew bîr çapkirin?

Duarê çewlîg ra dêyr

WELATÊ MÎN

Qwêy Çolîgo Şerefdîno
Tira gêrên şarîk şivîno
Pêşî bênu hêlê şuno
Şinî barê Bêrvuno

Welatê min welatê min
Çayir çîmun welatê min
Gul û nergiz welatê min

Pêşmergê êrziyay qwêyuno
Xeber kot êskêr tirk muno
Wuriznay we têyaruno
Bên sebeb cahîluno

Welatê min welatê min
Çayin çîmun welatê min
Gul û nergiz welatê min

Sêr çolîgo dar mazyêrî
Pêşmergun xwur silah bêrî
Pê eskêr romî qîr bikirî
Dûnya romîr bikir teng û tarî

Welatê min welatê min
Çayir çîmun welatê min
Gul û nergiz welatê min

Înî dêyr dewun dumarê
Çewlîg û Palodî yenî watiş.
Ma îni dêyr fêk xwertun
dewê.
Qur ra girofî.

Ariyekerdox:
Seyidxan Quric

Abîdin Dîno buharê li Amedê ye

Wênesazê dema me yê herî jî yên mezin Abîdin Dîno, buharê pêşangeha xwe li Amedê li ser dezgeha Doşo vedike.

Abîdin Dîno di mehên buharê de bi gelek hunermendên mezin re bi navê "Trêna Yilmaz Güney" dê bêne Amedê û li ser dezgeha Doşo ku ji ber firotina rojnameya Özgür Gündem'ê hatiye şewitandin û Doşo jî lêdanekê xedar xwaribû, bê raxistin.

Abîdin Dîno sedema vekirina pêşangeha xwe ya "Dest" û "rû" bi vê hevokê eşkere dike: "Êdî dem hatiye". Di pêşangeha Dîno de rûyên ku li destan dinêrin, rûyên li rojê, rûyên ku di meşê de ketine milên hev, rûyên kullmên şidandî yên karkerên rû bişirandî, yên jin û mêran, rûyên karkerên zarok û ciwan yên tijî hêvî, rûyên ku di penceran de dinêrin, rûyên ku ji çiya û golan silav dişinin û wêneyên rûyên bi sîmge hene.



Rojijmêr û çend belge

3

LÊKOLÎN

KAYA MÜŞTAKHAN

Belge I (24)

Paul Beidar(25)	M.Garzonî(26)
1925	1787
Adar	Adar
Nîsan	Nîsan
Gulan	Gulan
Hezîran	Xezîran
Tîrmeh/Temûz	Tîrmeh
Tebax	Tebax
Îlon	Îlûn
Çiriya Ewil	Çiriya Pêşî
Çiriya Paşî	Çiriya Paşî
Kanûna Ewil	Kanûna Biçûk
Kanûna Paşî	Kanûna Mezin
Sebat	Sivat (Suat)

Weke ku tê dîtîn P.Beidar 68 sal; M.Garzonî jî 206 sal berê, navên mehên Kurdî di pirtûkên xwe de nîşan dane.

Di nav Kurdan de ji bo meh û demsal (werz) an ji stran û mamikan helbest hatine nivîsandin:

Li ser mehan (27)

1

Kanûnê w Kanûnê/ Berf têt ji uzmanê/ Qira ebd û insanê

2

Sebale

Çi şer e w çî şewat e/ Xwezî nêv mehada nehata

3

Hijde bi Adarê/ Melyaket têt xwarê/ Gazî dikit beharê

4

Taviya Nîsanê/ Hêja ye malê Xurestanê

5

Heyva Gulanê/ Xweyê reza bi kul û kovanê

6

Yazde bi Hezîranê serê havînê/ Berê xwe bide zivistanê

7

Temmuz û Tebaxê/ Agir digirit axê/ Dû dirabit ji şaxê

8

Îlonê zik têt e/ Û dunya xêr e

9

Çiriye w Çiriye/ Mal teyr û tajîye/ Mirov dibin xweşîye

Li ser demsalan (werz) (28)

1

Bi pahîzê zû dake/ Bi beharê zû rake

Em hatin pahîza/ Çêkin cihê ezîza

2

Zivistanê/ Tengava ber mirinê

3

Biharê

Bereket têtê xwarê/ Xelk dibin şikirdarê

4

Havînê

Teyr gazî dikin meydanê/ Borî roja Re-mezanê.

Belge II.

M. Düzgün di nivîsara xwe de (Binêrin: M.Düzgün, Texwîmê Michael û Marie'ye Sero, Berhem, hejmar 8, rûpel 70, Gulan 1990) li ser rojijmêra Michael û Marie hûr bûye. Rojijmêr bi Zazakî (1990) hatiye çêkirin. Navên roj, hefte û demsal (werze) bi Zazakî ye.

Belge III. (29)

Dirêjahiya şev û rojan:

Di rojêkê de 24 saet hene. Lê dirêjahiya şev û rojan, di salê tenê bi carekê, li 23'ê (21) Adarê û di roja Newrozê, de dirêjahiya şev û rojê dibe wek hev. Herdu jî diwazde saet in. Ji vê tarîxê û pê ve şev bi dirêjbûnê, roj bi kurtbûnê ve diçin. Lê her wekî listeya jêrîn şanî dide roj tu caran bi qasî şevê kurt nabin.

	Saet	Deqîqe
Roja dirêjtir: 22 Hizêran	16	8
Roja kurtir: 22 Kanûna Pêşîn	8	11
Şeva dirêjtir: 22 Kanûna Pêşîn	15	49
Şeva kurtir: 22 Hizêran	7	52

Ji 22'ê Kanûna Pêşîn ve roj dirêj dibin û her roj saetekê û çend deqîqan bi ser ve zêde dikin:

	Saet	Deqîqe
Kanûna Paşîn	1	4
Sibat	1	38
Adar	1	30
Nîsan	1	26
Gulan	1	23
Hizêran	1	19

Ji 22 Hizêranê ve roj bi awayê jêrîn kêmkirî:

	Saet	Deqîqe
Tîrmeh	1	2
Tebax	1	50
Îlon	1	46
Çiriya Pêşîn	1	40
Çiriya Paşîn	1	14
Kanûna Pêşîn	1	17

CEMRE

Cemre çi ye? Li gora pêşyan hêman yanî insirên dinyayê çar bûn (ax, av, hewa, agir) û tebîet ji wan bi hev diket. Di nav wan çar hêmanan de ê xurttir agir bû. Carê ku agir digiha hêmanekî din, ji vê bûyerê re cemre digotin. Jixwe cemre bi mana pereng e. Bi gotinê din bi ketina her cemrê germî digihe hêmanekî din û wî divejîne. Cemreyên salê ev in:

NAVÊN ROJAN (5)

Kurdî	Almanî	Fransîzî	Îngilîzî	Tirkî
Yekşem	Sonntag	Dimanche	Sunday	Pazar
Duşem	Montag	Lundi	Monday	Pazartesi
Sêşem	Dienstag	Mardi	Tuesday	Salı
Çarşem	Mittwoch	Mercredi	Wednesday	Çarşamba
Pêncşem	Donnerstag	Jeudi	Thursday	Perşembe
Înî	Freitag	Vendredi	Friday	Cuma
Şemî	Samstag	Samedi	Saturday	Cumartesi

- 1-20 Sibat: Cemre dikeve hewayê
- 2-27 Sibat: Cemre dikeve avê
- 3-6 Adar: Cemre dikeve axê.

Belge IV (30)

Navên mehan Tablo (4)

Rojên hefte

Gotina hefte ji jimara heftê, bi xwerû Kurdî ye. Di hefteyekê de heft roj hene. Va ne navên rast ên van rojan û wergerandina wan a bi zimanên biyanî: Tablo (5)

JÊRENOT

- 24- Mahmûd Lewendî, Berhem, hej.9, 1990 rp.65 (Kitêbek: Gramaire Kurde 1926, Paris)
- 25- Paul Beidar: Papazekî Keldaniya ye ku gelek salan li Kurdistanê bi taybetî li mintîqa Behlan û Behdînan li bajarê Cizîrê û Zaxoyê maye, M.Lewendî, Berhem, hej.9, rp.65
- 26- M.Garzonî, "Bavê Kurdnasiy" tê navandin. Demek dirêj li Mûsilê jiya ye. Navê pirtûka wî Gramatica E. Vocabolario Della Lingua Kurda, Roma 1787.
- 27- Gramaira Kurde, P.Beidar ji M.Lewendî, Berhem, hej.9, 1990
- 28- P.Beidar, Gramaire Kurde, ji M.Lewendî, Berhem, hej.9, rp.66, Îlon, 1990
- 29- Remildar, Ronahî, hej.13, rp.4 (228), 1 Nisan 1943
- 30- Kurmanci, hej.1, Havîn, 1987 rp.4

Çavkanî

- 1- Aksoy, Gürdal, Kürt Dili ve Söylenceleri (Ankara, 1991)
- 2- Amedî, Botan, Kürtler ve Kürdistan Tarihi I (İst. 1991)
- 3- Bender, Cemşid, Kürt Tarihi ve Uygurluğu, (İst. 1991)
- 4- Bilge, Yakup, Süryanilerin Kökeni (İst. 1991)
- 5- Berwarî, Dildar, Li ser navên mehan (Roja Nû, hej.3, 1983)
- 6- Bleau, J. Kürtçe-Türkçe Sözlük (İst. 1991)

- 7- Cigerxwîn, Tarîxa Kurdistan I (Stokholm, 1985)
- 8- D. İzolî, Ferheng, Kurdî-Tirkî (İst. 1992)
- 9- Gray, I, Calendar (Persian) ERE-V.3
- 10- Günaltay, Şemseddin, Mezopotamya Tarihi (Ankara, 1937)
- 11- Hommel, Fr, Calendar (Babylonian) ERE, V.3
- 12- Huseyn, Feqî, Salname (Rewşen, hej.3, İst.1992)
- 13- Landon, S, Babylonian Menologies and the Semitic Calendars (London, 1935)
- 14- Macler, Frederic, Calendar (Armenian) ERE, V.3
- 15- Mihotuli, Selhaddin, Arya Uygurluklarından Kürtlere (İst. 1992)
- 16- Sayılı, Aydın, Mısırlılarda ve Mezopotamyalılarda matematik, astronomi ve

- tıp (Ankara, 1966)
- 17- Smith, Sdney, (Babylonin and Assyrian calendar) EB. V.4
- 18- Tigris, A. Kurterasti (Stokholm, 1991)
- 19- Tori, Alfabe Kurdî (İst. 1992)
- 20- Wandel, L.A. A. Sumer-Aryan Dictionary, par 1 (London, 1927)
- 21- Wehbî, Tewfîq, C.J.Edmons, Ferheng (London, 1971)
- 22- Welatê Tori, Kürt Kökeni Büyük Boylar (İst. 1991)
- 23- Welatê Tori, Birlikte Olduğumuz Halklar (İst. 1991)
- 24- Woods, F.H.Calendar (Hebrew) ERE-V.3
- 25- Xemgîn, E. Kürdistan Dini İnançlar ve Etkileri I (İst. 1992)
- 26- Rojijmêra Deng (1992)
- 27- Rojijmêra Komal (1992)
- 28- Rojijmêra Komkar (1992)
- 29- Rojijmêra Koma Azadî (1983, Şam)
- 30- Rojijmêra Medya (1992)
- 31- Hawar, Kovar (15 Nisan 1932 Şam, ya Bedirxan)
- 32- Ronahî, Kovar (1 Nisan 1942 Şam)
- 33- Rewşen, Kovar (1 Sibat, 1992)
- 34- Welat, rojnameya heteyî (22 Sibat 1992)
- 35- Ensiklopediya Britanica (deqa rojijmêr)
- 36- Ensiklopediya Meydan Larousse, Berg.II
- 37- Ensiklopediya Memo Larousse, Berg I
- ERE (Ensiklopediya of Religion and Ethics, James Hasting)
- EB (Ensiklopediya Britanika)
- 38- Maurizio Garzonî, Gramatica-e Vocabolario della Lingua Kurda, Roma 17
- 39- Paul Beidar, Gramaire Kurde, Paris, 1926
- 40- Rohat, Kürdoloji Biliminin 200 Yıllık Geçmişi (1787-1987), 1991- İst.
- 41- Filozoflar, George Thomson, 1988 İst. (Beş 3, Babilden Miletosa)

NAVÊN MEHAN (4)

Kurdî	Almanî	Fransîzî	Îngilîzî	Tirkî
Çile	Januar	Janvier	January	Ocak
Sibat	Fêbruar	Février	February	Şubat
Adar	März	Mars	March	Mart
Nîsan	April	Avril	April	Nisan
Gulan	Mai	Mai	May	Mayıs
Hezîran	Juni	Juin	June	Haziran
Tîrmeh	Juli	Juillet	July	Temmuz
Tebax	August	Août	August	Ağustos
Îlon	September	Septembre	September	Eylül
Çirî	Oktober	Octobre	October	Ekim
Teşrîn	November	Novembre	November	Kasım
Kanûn	Dêzember	Décembre	December	Aralık



Paul Eluard û Pablo Picasso, li Kongreya Aşîxwazên Dinyayê (Polonya, 1948)

Helbestvanê evîn û azadiyê Eluard

'Destên me hene yên ku em bidin hevûdu Bigirin destê min ez we bibim dûr'

Murat Ergin

Helbestvanê mezin ê Fransî Paul Eluard di 14 Kanûn 1895' an de nêzîkî Parisê li Saint-Denisê hatiye dinê. Bavê wî bi muhasebekariyê jiyana xwe didomand. Zarokatiya Eluard li Saint-Denisê û Aulany-Sous-Boisé derbas bû. Di 12 saliya xwe de çû Parisê. Heta 16 saliya xwe li dibistana Colbertê xwend. Bi destpêka Cenga Cihanê ya Yekemîn re çû leşkeriyê. Ceng û leşkerî, tesîra xwe li ser Eluard nişan dan. Eluard, di pirtûkê xwe yên pêşin de van tesîran anî zimên. Di sala 1917' an de pirtûkên xwe yên bi navê "Wezîfê û Xem" û "Helbestên ji bo Aştiyê" weşand. Di vê demê de Eluard, bi helbestvanên mezin; Aragon, Breton, Soupault, Tzara û Reverdy re ket nav têkiliyê. Di dawiya cengê de Eluard, kete nav herêketa "Dada" yê. Lê herêketa "Dada"yê di sala 1922'an de belav bû. Piştî herêketa "Dada"yê belav bû, Eluard rissamê 'surrealist' Marks Ernst nas kir, û ket bin tesîra fikrên Maks Ernest yên surrealist. Eluard li aliyê din jî, têkiliyên xwe bi Picasso, Breton, Chirico û bi Dalî re geş dikir û bi tesîrên van têkiliyan ve, di pirtûkên xwe yên heta sala 1934'an weşand de, helbestên surrealist nivîsî. "Paytexta Êşê (1926)", "Helbesta Evînê (1929)", "Jina Rasterast (1932)" û "Gula Gel (1934)" ji van pirtûkan e.

Eluard di 15'ê Adara 1924'an de, dest bi gera dinyayê kir. Berî şoreşê derbasî Spanyayê bû. Dema ku vegeriya Parisê, helbestên Garcia Lorca wergerand zimanê Fransî. Eluard di nav van deman de, ji tesîra serûbinbûyînan û bûyerên dinyayê jî dûr nediket. Ji ber vê yekê jî, hêdî hêdî ji derdora surrealistan dûr bû. Eluard êdî bawer dikir, ku pêwîst e helbest alikariya mirovan bike. Û li diji xira-

biyan (nebaşî), mirovan bide hevûdu. Ev bawerî xwe di pirtûkên wî yên "Herikiya Xwezayî (1938)" û "Strana Bêkêmasî (1939)" de nişan dide. Eluard bi destpêkirina Cenga Dinyayê ya Duyemîn re, di sa çû leşkeriyê û gava Alman ketin nav Fransayê wî jî di nav herêketa berxwedana li dijî dagirkeriya Almanan de cihê xwe stand. Eluard ji bo rizgariya welatê xwe bi qehremanî xebitî. Helbestên ku di vê demê de dinivîsî di nav gel de bi dizî belav dibûn. Helbesta wî ya "Azadî" di vê demê hat nivîsîn. Di nav helbestên ku di dema şerê berxwedana Fransayê de hatine nivîsîn de helbestên herî delal ên Eluard in. Mîra helbestên wî yên şer, weke: "Gabriel Perî" "Rexneya Helbestê" û "Tarîkirin" kesên ku van helbestan dixwîne diheje.

Tarîkirin

Deriyên girtine çî biki

Çî biki em di hundir de mane

Rê hatine girtin

Bajar têk çiyê çî biki

Birçibûnê dest pê kiriye

Di dest de çek nemane çî biki

Şev e, dest pê kiriye

Bi hev şa jî ne bi çî biki

Di helbestên Eluard ên di pirtûkên pêşin de tesîra surrealistîzmê heye. Ku mirov li berhemên wî yên ewil binêre wê dengêkî girtî di helbestê de bibîne. Dengêkî bi dinyaya nava xwe, bi tenêbûna xwe û bi xeyalên xwe re girtî.

Eluard di helbestên xwe yên surrealist de, bi pirranî, jiyana xwe ya şexsî û xeyalên xwe bi zimaneke girtî û bi îmgê û îstîreyên delal dînan ziman. Lê her çiqas helbestên wî girtî xuya bikin jî, xwe jî berbangê qet dûr nedixistin. Helbestên wî yên surrealist jî tenêbûnê zêdetir helbestên "hez"ê ne. Di helbestên Eluard de, şev hêviya xwe ji sibê qut nake.

Eluard piştî ku ji helbestên girtî û


şexsî derbasî helbestên civakî, kolektîf û vekirî dibe, raste rast xwe ji dinyaya îmgeyan dûr naxe. Û lirizma xwe qet wîna nake. Eluard piştî ku xwe ji bin tesîra surrealistîzmê derdixe, naverok û şiklê helbestên xwe jî diguhêre. Eluard ji tenêbûnê derbasî bi hevrebûnê, ji xeyalên şexsî û gotinên girtî jî derbasî gotineke vekirî, hêviya şîrikî dibe. Li gor dîtina Eluard, dilgeşiya mirovan ji peyven helbestvanan giranbuhatir e. Di nav rehên Eluard de herdem xwîneke mirovahî, civakî û têkoşer herikiye. Ji ber vê yekê jî, helbestên wî jî şevên ku bi xeyalên tarî raxistî, derbasî dinyayeke jî bo dilgeşiyê dibe. Yanî helbest jî bin siyê tine ber rojê; ronahiye.

Eluard di berhemên xwe yên dawî de ezmaneke ji hebûnên (varlık) bi çiçek, çavkaniyên cemed û ji rengên bi melodî vedike. Di helbestên wî yên dawî de, dawiya berbangayî navîn keskesora dinyayê dizê (diwêlîde), obje yekê yekê derdikevin holê. Di-biriqin, ronahî dibin. Êdî karê helbesta tenê ev e ku, objeyan bîne ber çav; bi navê wan gazî wan bike. Eluard jî bi navê objeyan gazî wan dîke. Dinyaya ku Eluard derdixe holê, ji rehên dil hatiye honandin. Bi rastî jî helbestên wî jî serî heta binî lirîk in. Helbestên Eluard, di nav helbestên dinyayê de, jî alî îstîreyê ve gelek dewlemend in. Helbestên wî bi qasî lirîkbûnê mihafezekar in jî. Eluard di warê helbestvanîyê de ji hemdemên xwe zêdetir nêzîkî helbestvanên sed sala XIX'an e. Û bi pirranî jî di refên Lamartine û Baudelaire de ye.

Eluard ji sala 1942'an bi şûn ve ket nav politikayê. Di vê riwê de gelek nivîs û helbest jî nivîsî. "Rastî û Helbest (1942)", "Helbestên Politik (1948)" pirtûkên di vê demê de hatin nivîsîn. Eluard di sala 1952'an de di 57 saliya xwe de mir. Li paş xwe 35 berhemên nemir û bêhempa hişt.

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Meclîsa Niştimanî

Di sala 1965 an de, ez miftiyê Dutaxê (navçeyeke Agiriyê) bûm. "Bi stûyê şikestî, tasê neqisî" Süleyman Demirel, di wan salan de jî serokwezîrê Tirkîyê bû û dewra vir û faşizma Süleymanî dest pê kiribû. Dîsa wekî her caran, diyaneta bêîman û bêfedî jî, kaşoyê destê wê faşizma hov, gemar û qirêjî bû. Bi navê dîn û îmanê, ji kemalîzm, turanîzm û masonîzmê re dixebitî û xizmetên xwe yên olî û zirtolî dimeşandin. Her dem, mifetiş û polêsên xwe dişandin ser min û min bêhizûr dikirin. Teqe req, bigir-vekêş, şer û dozên min û wan, wilo dest pê kir û domand. Dawî min ji Kurdistanê avêtin bajarê Sînopê, dû re şandin Zongildaxê, ji wir jî berê min dan Tekirdaxê. Bi kurtî di salekê de, ez li deh cihan gerandim. Çend caran min ji miftiyê avêtin û ez jî nû ve bi biryara danîştayê vegeriya wê wezîfa bêşerêf û qirêj. Dawiyê, min sê salan li ser hev, ji nexweş-xaneyan rapor stand û bi malûlî teqawud bûm, ji penca wan hov û harên bêfedî derketim. Lê belê, tu caran ji zilm, perçiqandin, îşkence, heps û zindanên faşîstan xelas ne-bûm. Her wekî her Kurdê xwenas, ez jî heta îro di bin zilm û zora wan hovan de têkoşîna mafên demokrasî û însanî didomînim. Bi baweriya min, di dawî de, zafer ya me ye. Lewre zalim her dem, bi ser serî ketine û payîmal bûne. Dîroka cihanê wilo bûye û dê ji vir û pê ve jî wilo be. Quran jî wilo dibêje.

Dema ez ji Kurdistanê hatim dîrûkirin (sirgunkirin), evîna welat, derd û keserên xurbetî û dîrûtiyê, ez ji têkoşîneke geş û nû re amade û teşwîq kirim. Min bi her awayî baweriya xwe anî ku, wê her wekî hemû gelên bindest û mezlûm, gelê Kurd jî, ji binê zilm, zor, tadeyî û koletiyê xelas bibe û dê bigihîje hemû mafên xwe yên însanî û demokratîk, dê ew jî weke hemû gelên cihanê, di qada cihanê de, cihê xwe bigre û weke mirovan bijî.

Ev îman û baweriya min, wilo qetî û jî dil bû ku, di sala 1966 an de, dema li Sînopê bûm, min wiha digot: "Heta sala du hezar û duduyan (2002), ezê bijim û azadiya Kurd û Kurdistanê bibînim, dû re mirin jî xweş e". Min vê bîr û baweriya xwe ji pîrr keçan re, ji pîrr heval û hogiran re, ji jin û zarokên xwe re her tim digot û dubare dikir. Heta ku sala par, li başûrê Kurdistanê "Hikûmeta Kurdî ya Federal" hate îlankirin. Zarokên min û dayika wan, gelek dost û hevalan, ji min re gotin: "Seyda gotina te derket, va ye Kurdistan, hêdî hêdî azad dibe, herhal êdî mirina te jî nêzîk bûye". Min ji wan re vê bersivê da: "Ev ne azadiya bi tevayî û hemû Kurdistanê ye, ez nivîşkan (kêm) qebûl nakim". Heta ku di 19-20 1992 an de, li Almanya, bajarê Gissen'ê, delegiyên Meclîsa Niştimaniya Kurdistanê civiyan û panzdeh (15) nûnerên (mebûsên) Kurdistanê Yekbûyî hilbijartin û min li ber çavên xwe dît ku hîmê azadiya Kurdistanê, bi rewşeke demokratîkî hate avêtin, min bawer kir ku dê Kurdistan jî azad bibe. Di gel pîrr mêvanan, min jî, hilbijartinê bi dilxweşî û heyecaneke geş temaşe kir û dît. Baweriya min bi temamî çêbû ku texmîna min a 30-40 sal berê wê rast derkeve. Yanê, ez heta sala 2002 an namirim û ezê Kurdistanê azad û yekbûyî bibînim. Min evqas jî dît bes e. Êdî ez bimirim jî, xem nîn e. Welat sax be, azadî û demokrasî bijî.

Gelê Tirk çî difikire ji bo gelê Kurd?

Hesenê Omerî

Berî panzdeh-bîst sal digotin, Kurd hemû qaçaxçî ne. Wê demê mehmetçîk li sînorê Tirkîyê û Îranê pênc qaçaxçî kuştin. Rojnâme-yên Tirkîyê hemû ev bûyer nivîsandin. Rojekê nûçevan ji serleşker dipirse: "We çî li ser wan girtin? Bersiv: "Du cot pêlav (sol), kiloyek titûna çixarê û tenekeke dohn (gaz yaxî)." Mal ava ew ne qaçaxçî ne, gundiyan feqîr û belengaz in. Çi bibe bila bibe ew qaçaxçîyê dikin.

Di navbera 1970'yî û 1980 yan de digotin ew 'eşqîya' ne. Toz û dûmanê bi ser wan dixistin. Li çîya qul bi qul digeriyan digotin 'em li eşqîyayan digerin.' Di nûçeyên TV de digotin, "Mehmetçîk operasyonêkê çêkiriye, li çîyayên Cûdî, Herkol, Azizyan qul bi qul geriyane, koka eşqîya birîne."

Sal derbas bûn, roj bihurîn, dem hat li sala 1984 an sekini. Navê me ev car bû 'terorîst'. Li temamê cihanê belav bû: "Gelê

Kurd terorîst e", "alîkariya terorîst-tan dike", "PKK terorîst e", "PKK, zarokan dike" û hwd.

Dema ku mirovên Tirk û yên cihanê ji me dipirsiyan, me ji digot "PKK terorîst e." Bi wê kirinê, îro em li hember dîrokê tewandar in. Dîrok me efü nake.

Em werin ser mesela kovara Tempo (Hejmar:37). Ev kovar li Stenbolê anketek çêkiriye. Ji 600 kesî pirsîye ku hûn pirsgerêka Kurdî çawa dibînin? Ev pirsgerêk wê çawa çareser bibe. Van pirsan ji her kamanî ji kesa pirsîne. Ronakbîr, mamoste, karmend, jikarketî (emekli) tezgahdar û hwd... Bersivên van mirovan pîr ecêb in. Tu dibê qey her yekê li dinyayeke din diji. Ramanên wan bi giştî kevneperest û sovenîst in. Li hember van pirsan bersivên hinek ji van kesa ev in.

1) "Lawê min li Keşanê leşker e. Dema ku PKK leşkerên me dike ev li xweşa leşkerên ku bi eslê xwe Kurd in, diçe. Tu, wê însaeta hanê dibîni? Xebatkarên wê hemû

Kurd in. Hemû wek dijminan li me dinêrin." Ev gotinên hanê aidê jikarketiyekî karmendê bançeyê ye. Gotinên wî wiha didomin: "Ji bo leşkerêkî xwe ez hezar terorîstî dixwazim. Kurd hemû eşqîya û terorîst in. Emê wan teva ji nav xwe paqij bikin. Ji ber PKK'ê em hêdî hêdî ji hemû Kurdan nefret dikin."

Ûn ku dibêjin Kurd û PKK yek in %74 in. PKK bûye gel, gel bûye PKK.

2) Mamosteyek 40 salî.

"Tu armanca wan nîn e. Aboriya wan pîr xirab e. Dewlet li wan xwedî derneketiye ew ji xwe avêtine PKK'ê. Kurd çî dixwazin? Ew bi xwe jî nizanin. Jixwe zehfên wan cahil in. Xwendin û tahsila wan nîn e. Ew ji serxwebûn û azadiyê tiştêkî fêm nakin."

Di anketê de ramanên %58 î bi vî awayî ne.

Ji sedî pêncî û neh, Kurd ne li pey otonomî û mafên çandê ne. Hinek wiha dibêjin. Hinek jî yanî %70 li pey serxwebûn azadiyê ne.

Ji pîrsa "Ev pirsgerêk divê çawa çareser bibe?" re ev bersiv hatin.

%50 dibêjin çî dixwazin bidin wan da ku em ji wan xelas bibin. %50 jî alîkarê dayîna mafên demokratîkî ne. Şewirmendekî maliyê yê 50 salî dibêje "Kurd tenê ji zimanê hev fêm dikin. Ew bi xwe pirsgerêka xwe nas dikin". Karmendekî 44 salî jê THY ê jî dîtînen xwe wiha tîne zimên: "Eger dewleta me tedbîr negire wê Dêrsimeke din çê bibe."

Mistefayê Beton û Îsmetê Kerr çî kiribin, dewlet jî wê di wê rêçê de be. Mirovekî 24 salî û bêkar wiha dibêje: "Gerîna Awarte" (Sîkyönetim) jî vê pîrsê çareser nake. Divê yên ku alîkariya PKK'ê dikin tevde berhev bibin û bi bombeyan îmhaya bibin. Mebûsên HEP'ê yên di meclîsê de jî divê hemû bi dar de bînin kirin. Ha jî we re, ev mesele evqas hêsan e."

Mirovên ku dibêjin politîka dewletê hişk e %5 in. Ûn ku dibêjin hikûmet qels e %85 in. Ûn ku

dibêjin dewlet terorê li ser Kurdan dike %3 ye. Ûn ku dibêjin li herêmê şer heye û dewlet terorîst-tan tenê dike, destê xwe nade sivilan û ev jî tiştêkî normal e, %95 e.

Ûn ku dibêjin bila Kurd bar kin, herin Kurdistanê %65-70 ye.

Ûn ku qala biratiya gelê Kurd û Tirk dikin %50 ye.

Fermo li Tirkên bi aqil û mantiq binêrin. Ramanên wan ji yên Almanên Nazi xerabtir in. Mala Xwedê ava be Almanan jî, li dû xwe hiştin. Hûn bi Pîter Botha yê Komara Başûrê Afrika re dikevin bezê.

Em ji Kurdan dipirsîn: Lo Kurdno, hûn wiha ne? Ez ne bawer im hûn wiha bin. Hûn hemû tev hişyar bûne. Bûk û keçên me, zar û zêçên me bi hawar û qîrîn gazî dikin. "Kûçikno, xwînxwaro, kuşdero em we naxwazin. Dengê pêşmerge û qehremanên me ji çîyan bilind dibin. 'Em tene, em tene!'"

Dewlet ber bi krîzeke girs ve diçe

Cumalî Cotkar

Komara Tirkîyê, di bin serokatîya M. Kemal de damezirî û jî vê demê heta niha hertim li dijî gelê Kurd di offensîfê (êrişê) de bû û xwe bi darê zorê dabû qebûlîkirin. Îro jî ev Komar dixwaze eynî metodan bi kar bîne.

Lê rewş di van çend salên dawî de piçekî hatiye guhertin. Niha gerîlayên Partiya Karkerên Kurdistanê di offensîfê (êrişê) de ne û Komara Tirk bi artêşa xwe ya nêzîkî milyonekê xwe gelek caran bi şûn ve di-de û dikeve defensîfê (parêzî). Di dîroka Kurdan de cara pêşîn e ku Kurd wek bûyerên Newrozê li Şirnex, Cizirê û Nisêbinê nişan dan ku

ji tanq û çekên giran natirsîn û navêrin. Gel êdî dikare li hember û dijî dagirkeran bisekine û bibêje: "Bimire...û bijî..." cara pêşîn e ku esker û polisên dewletê ji Kurdan ditirsîn. Cih û cihan ji bo mirov û artêşa dewleta Tirk, polis û siyasetvanên paşverû teng dibe. Êdî dewlet jî, bi dezgeh û saziyên xwe nizane çawa bersiva vê offensîfê gelê Kurd bide. Dewlet, ne daxwaz û heqên gelê Kurd qebûl dike û xwe ji bo diyalogê amade dike, ne jî dikare ji tîrsa Ewropa û protestoyên din bê xeber be û dest bi qetliameke mezin bike. Bi rastî, dewleta Tirk bê çare maye û nizane ji bin vî barê giran çawa derkeve. Ji aliyekî Partiya Karkerên Kurdistan û gelê Kurd û li aliyê din

deriyê Ewropa û Civata Ewropa (CE). Heger Komara Tirkîyê, gelek bi pêş ve here û bixwaze bi qetliamekê pîrsa gelê Kurd çareser bike, mimkun e. Ewropa deriyê xwe ji Tirkan re bigire û wan di pêşerojê de neke endamê civata xwe. Di Newrozê de, bikaranîna çekên ku ji Almanya hatibûn kirin û sekinandîna çek fîrotina çend dewletan, dewleta Tirk mecbûr kir ku vê pîrsê careke din baş bifikire. Heger qetliamekê neke jî, parti û tîkoşîna gelê Kurd dê roj bi roj xurt bibe û bi pêş ve here.

Lê, li aliyê din hejmarek Kurd, bi taybetî Kurdên ku berê siyaset dikirin û niha jî bi karê ziman û edebiyatê ve mijûl dibin û di riya "pîspo-

ri" de dimeşin jî hene, ku ew jî di rewşê xerab û ne baş de ne. Ew bawerî bi gelê xwe nakin û hercar dibêjin: "Dewlet, dê êrişî Kurdan bike û bi hezaran mirovên me wê werin kuştin. Bi van metodan gelê Kurd nikare bi ser keve. Divê em metodên çekdarî bi kar neyînin, divê em metodên siyasî, demokratîk û diplomatîk bişuxulînin û nerm bin."

Lê, li vir, emê dîtînen ku em pê dizanin, pêşkeş bikin: Di dîroka Kurdan de gelek kuştin û qetliam çêbûne. Mimkun e, ku di pêş de di-sa qetliam çêbibin. Mimkun e şerê azadî û berxwedanê were pelçiqandin. Mimkun e gelê Kurd dişa bi ser nekeve. Lê, Heger ew şer, şerê ku ji bo jiyanê nû, jiyanê azad, civa-

keke wekhev tê dayin bi ser nekeve û negihîje armanca xwe, ew çewtî û şaşî bi metodên ku tînen bikaranîne ve ne girdayî bin. Lê mimkun e sedemên tîkûnê bikaribe ew bir û baweriyên ku di dîroka Kurdan de ew gelek in dixwazin rê li ber gelê Kurd tarî û wînda bikin, bin. Bi rastî, ew bedbûn (pesimîzm) dikare roleke gelek negatîv bilîze. Heger mirov her roj bibêje, "em bi ser nakevin" bi ser nakeve. Ew gotinên pesimîst dikare derb li his û nasnameya neteweyîyê, ku van çend salên dawî de çêbûne, bixe.


Roj bi roj pîrs û rewşa gelê Kurd li cihanê tê munaqesekirin û gelê me jî hişyarbûneke dîrokî nişan di-de. Ji bo vê yekê optimîzm (geşbûn) şert e. Bi optimîzmê mirov dikare hem xwe û hem jî civak û gelê xwe û herwiha mirovatîyê bi pêş ve bibe û bi vî awayî piçekî wezîfeyên xwe yê insani bîne cih.

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Serokê Şoreşa Kubayê. Di wênê de tê dîtî 2-Navekî jinan (di stranên gelêrî de gelek derbas dibe)/ Navekî jinan 3-Fîrar/ Pezên kûvî 4-Ap/ Navçeyê girêdayîyê Diyarbekir 5-Navgîn/ Zêdekîrin/ Zayenda merrîtiyê 6-Jehra cixareyê 7-Eşq 8-Polisên eskerî yên Naziyan/ Kînnivîsîna rêxstînekê li başûrê Kurdistanê 9-Akademiya Mahsum Korkmaz li wê derê bû. Nêzîkî deh salan, ji bo perwerdekirina leşkerî, ji gerîlayan re xizmet da. Di 1992 an de hate girtin/ Li rojhilatê Almanya ajansêke nûçeyan 10-Ard/ Bi pîranî di mekîneyan de, di nav du parçeyên ku bi hev ve tene girêdan de, tê bikaranîn

Serejêr: 1-Kinçeke Kurdî/ Cihê ewran diguhêre 2-Xwegihandîna başiya herî bilind/ Qaf 3-Çûkekê, hehecok 4-Navekî mêran (weke ku di nav gel de tê xerakirin binivîsin)/ Toxim/ Sembola Actînyûmê 5-Fermana lêkirinê/ Herf 6-Bajareke Kurdistanê 7-Efü/ Malbatên esil û mezin, beg/ Jehreke rewilkuştîne 8-Sebeb/ Dabawerkirin 9-Navgîneke rêwîtiyê 10-Yên ji hîrî çêdibin 11-Menzel 12-Sembola Îrîdî-ûmê



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇUYÎ

Çeperast: 1-Hemza Beg/ Med 2-Îsa/ Vezelîn 3-Kişwer/ Ronak 4-Ar/ Anîn/ Ramî 5-Arok/ Dik 6-Îdrîs/ Pe 7-Dîd/ Gêr 8-Lt/ Ateşe 9-Îtalîk 10-Sor/ Pike

Serejêr: 1-Hikarî/ Lîs 2-Esîr/ DDT 3-Maş/ Arî/ Îr 4-Warîdat 5-Avenos/ Tap 6-Berîk/ Gelî 7-Ez/ Pêşik 8-Ger/ Dereke 9-Lorî 10-Mînak 11-Enam 12-Kîn

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnâmeya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

İş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyêke pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

DIMILKÎ Hîroj qij Kurdon welaî xwi di xerib î

Payiz serê 1971'yî yiv. Serê qedêrî hîrî (3) aqjon dewê Gwelon (Golan) iv. Çîçêk payiz çemlişyêv, la ê aqjon bîv a. Destpêkerdiş heyatêko new iv. Destpêkerdiş prosesêko new iv.

Sêrî sivê lez iv. Derûdoran qeşa gwiretîv (girotîbî). Dewê Gwelon (Golan) di tarî û roşnayî hêdî hêdî cyew bîn. Nata- weta livî gotiv dewijon. Tevera qer-ratun êsên, Nizdê kîk (kêk) êdî veng veng omên. Veng vengî însananon iv. La merdum yew nîkerdên. Bi nizdî omayîşî qeratu-non ra veng zî bîn zelal. Vengêko tenik û bi nezm amî. İn veng vengî cînon iv. Evla ti şînî çâ?

- Ez aqjon (zarokan) be-na mekteb

- Koncî mektebî?

- Mektêb yatîlî

La ti nîşkên xêrî xwê di lajî mazî tê biberdê. Wi (bavî lajêk) tya nu.

Benu, ez bêrî. De lajek çawu (o) byarê.

Riyêko sêrcer û asî di re-qî- reqê lingon a. Evla lez keno, aqj zî bi vazdayîş lin-

gon donî wera û nonî rû. Binî lingona xîç û twez wir-zenu. Sari di bin hezaron fi-ki-rî. Fikir aqjîfî. Qêlbî aqjon zê saet donu perû. Kêf û şa-hîyê yina, şin bajarêko ne-wî. Yinir zê xiyalêt yeno. Zeg merdum honêk bivînu û sêrî sivê jî raşt ay honî xwi byeru. La xêrbî şahiyê yin tay iv zî bînek şiknena

- Silamu aleykum

- We aleyku veselam,

Evla. Ti xêyro

- Şikir, mî xêru. Mi xij ard,

erzena mekteb, la (lêbelê) qilikî (Por) yin derg o.

Berber ez aqjîkî yin çî qeydî cakerî?

- Numrê yoy bes o.

Sêr riyê asfaltî di vir vira erebân û qêriyê însanan a.

- El (Elo), laj Evlê, bawo ma şînî çâ?

- Lawo ez şîma bena mekteb. Şîma wonên û bîni merdomî pîl.

Baxçêko bîrc kerdî û berêko astînîn. Kîştê bêr a wêfîn id, zerê unîkonî syon (reş) û yaxonî spiyan di kêkerdiş kijon. U sarê ra vazdên sarî bîn. Tikîzî vêrî

bê di kotî ryez (rêz) ku şyêrî tever. Sarê yin di zî yow, qatêk kinc perdayê qirwatêk mil da, esto. Bi zonêk qisêkenu ku aqjon Evlê rî zaf xêrb. yeno. Tew nîkwena Xêlîl persenu;

- Bawo, in kom u?

- Lawo in mahlim u

Merdul warî qat kincan;

- Buyur, ne îstîyorsun? (kerem bik, ti çîta wazên?)

Evla;

- Xocam çocoxlari ge-tirdim (Xocam, mi aqj ard.)

- Adlari ne? (Nomê yin çîttê)

- Elo, Mikail, Xelîl

- Bekleyîn (vinderê)! Ru-şen Hanim şu çocukların kaydini yap ve üzerindeki bitleri falan kontrol etir (qêydî in kojon viraz û as-pijon mispijon yin qontrol bik)

Mahlim (bi Tirkî vonu): Temam Abdulah Beg şîma eşkên şyêr.

Evlê: -ez spas kena

Ruşen berî sinif kenaa (vedike) û persena; sarê (serok) ina sinif kom û (Ru-şen bi Tirkî qisêkena)

- Ez a, Teyib- Teyib in aqj



new ê. Ay rêzon piyînon di ca bid cil Tayib (wi zî Kurd u); - oturun şuraya çabuk (lez tya rîşê)

Malîk: - Xelîl in von se?

Belê, rojê ewil ê mekteb bi xem û xiyalon û talî dest kenûpê. Kêf û şahî rojê ewilî dişikena. Xêlîl, Elo û Malik welaî xwi di, myon

(nav) merdumonî xwi di vîst kîlometri dewê xwi ra dûr xwi rwejê (rojê) destpêkerdiş mekteb xwi bi xwi xerib û bêkes vînen. Gelo in qedereko bextreş û dramafîk nu? Bi hezaran aqj Kurdon in qedera nî-viyêta û nîvyerên ra?

Bonglonij

Teyrê baz ev çend roj bû ku bê xwarin mabû. Li ezmên difiriya û çavê xwe li erdê li xwarinê digeland. Ji birçîna hêz di baskê wî de nema bû. Ji ezmên ber bi jêr bû. Nêrî ku tiştêkî wek kevirêkî li erdê dimeşe. Xwe nizim kir, dît ku kûsiyek. Bi tirs nêzîkî kûsî bû; li erdê danî. Ji kûsî pirsî, got:

-Tu çawa yî birakê kûsî? Tu bi ku ve diçî? Xuya ye ku zikê te têr e.

Kûsî jî sekinî, li teyrê baz nêrî, got:

-Erê zikê min têr e. Çima ma tu birçî yî? Ji min re xwarin dîtin ne tiştêk e, ji min re xwarin pîr e. Em çî

bibînin em dixwin.

Baz got:

-Erê welle ez birçî me. Ev çend roj e tiştêk neketiye qirika min. Tu teba jî tune ye ku ez bixwim.

Kûsî kenîya û got:

-Tu çî bê aqil î birakê baz. Ji xwe re kûsiyekî mîna min bibîne, li tehtê xe, parçe bike û bixwe.

-Tu baş dibêjî birakê kûsî, lê ez newêrim nêzîkî we bibim.

-Çima?

-Ez çî zanim hema ez ji we difirsim. Hûn dengêkî derdixin, dibêjin, xuş, puf, tis... Ez jî dibêjim qey hûn pîr bi hêz in. Ez newêrim nêzîkî we kûsiyan bibim.

Kûsî kenîya û got:

-Lî aqlê te be bazo. Ew dangan giş vala ne, ne tiştîk in. Tu dixwazî rabe kûsiyekî bibîne û biceribîne.

-Baş e, birakê kûsî, Xwedê ji te razî be. Te dilê min hênîk kir. Ezê rabim ji xwe re li kûsiyekî bigerim.

Teyrê baz bi hewa ket. Firiya, firiya, ji ber çawa wînda bû, bi ezmên ket. Geriya, geriya lê kûsiyek jî nedît. Got belkî kûsiya giş xwe veşartine.

Teyrê baz ji xwe re got: "Ji kûsiyê min çêtir tune. A baş ez herim wî bixwim." Vegeriya cem kûsiyê xwe. Nêzîkayî lê kir û jê re got:

-Birakê kûsî li qisûra min menêre. Ez çiqas geriyam, negeriyam min tu kûsî nedîtin. Ezê te bixwim.

Kûsî bi tirs got:

-Wê çawa bibe birakê baz? Tê çawa min bixwî?

Kûsî kir pufe puf, xuşe xuş û tise tis. Lê baz guh nedayê.

Got:

-Qet meke xuşe xuş. Ez ji te natirsim. Te bi xwe ji min re got, xuş xuşa me ne tiştêk e. Êdî ez nema ji te difirsim. Te ev aqil da min. Cezayê xwe bikişîne. Ez çawa bikim?

Teyrê baz rahişt kûsî û li tehtîkê xist. Kûsî parçe parçe bû. Teyrê baz ket ser kûsî têr xwar û firiya bi ezmên ket.

Huseyîn Deniz



Ji pênûsa Apê Musa Yaşar Kemal

Musa Anter ev nivîs di 12'ê Sibata 1992'an de ji bo Welat nivîsî bû

Di sala 1895 an de neqeba Osmaniyan û Rûsya bû muharebe. Ehmedê Xanî di şîra xwe de dibêje "Kurd tim li sînoran armancên tîra dijminan in" Yanî Ereb, Ecem, Tirk û Rûs kengî bi hev re şer bikin tîrê wan li Kurdan dikeve. Kurdistan ji van zaliman re bûbû sûrek û bi navê niha, ji wan re bûbû paspassek. Nivê herba van miletên xerîb li Kurdistanê bû. A talî di 1915 an de bû. Osmaniyan, Ermeniyan dikuştin Rûs û Ermenî jî, heyfa xwe ji me Kurdan hildianîn. Em Kurd ne wek ehlê Tirakye û Egeyê bûn. Yewnan û Bulxar hatin heta Edîrne û Yewnan hat heta Bursayê. Yekî Tirk ji mala xwe derneket, tewer Yewnan û Bulxar ezimandin, ev ne heqaretek e, rastiyeke tarîxî ye. Lê ku Rûs û Ermenî ketin Serheda Kurdistanê Kurdan qebûl nekir, mal û milkê xwe hiştin dev ji xwarina xwe ya ser tifikan berdan, zarokên xwe ber bi xwe ve kirin û ber bi Kurdistanê jêrî ve reviyân. Mala minê, niha li her gundekî Kurdistanê jêrî mezelekî mihaciran heye. Ên ku ji birçîna û ên ku ji nexweşiyên mirine. Dewleta Osmanî ku wê çaxê hikûmeta wan Îtihat û Terakî Partî bû, ew jî ji Êris û Ermeniyan ne hindiktir, dijminê Kurdan bûn. Îşte bavê Yaşar Kemal bi wî hawî hatiye Edenê, eslê wî mihacirê Gewaşê ye. Kemal li Qedirliya qeza Edenê hatiye dinyayê. Diya wî û bavê wî Kurd in. Lê îro bi mihacirtî, feqîrtî û bi Kurdî di bin awirê Tirkan de mezin bûye. Xatirên min û Kemal bi hev re gelek hene. Hin ên dewra wî yê feqîrtiyê de û hinêk jî, ji yên dewra wî tirtiriyê de.

Carekê ez di kewna xwe de me, ez û hevalê xwe Nejat Cemîlpaşazade em çûbûn plaja Küçükalyayê. Em tekûzin, tîrê û tije ne, me di behrê de sobayî dikir, me dît dengê ji derveyî plajê hat. Bi Kurdî bêmal, bi fikandin digot. Dengê wî evqasî bi me kêr kir, bi sobayê em çûn bi



Li Stenbolê Çukurovayiyek; Yaşar Kemal di 28 saliya xwe de.

alî ve, me nêrî ku ji derveyî plajê li ser tehtekê lawikekî feqîr, kor û bi derpiyê spî li ser tehtê rûniştiye. Min got, "Bîrako tu kî yî?"

Bi xeyd: "Te çi jê ye?"

-Heval, te bi Kurdî difikand, bi me xweş bû, ji ber vê ez dipirsim.

-Îca çi ye? Ezê bi Kurdî bifikînim.

-Ma tu Kurd î?


-Ez çi bim, ez êw im.

-Me xeyîd bîrako, min gelekî hez ji mêraniya te kir, ku ez edresa xwe bidim te tu karê bê cem min? Xwe da wî alî û wî alî talî got: "Erê". Çû ji reşayê ji bêrika xwe qelem û kaxez derxist û edresa min nivîsî.

Piştî du-sê mehan, tu nabê tê ku min bibîne. Li Firat Yurdê min ji xwe re dergevanekî Petirguwî Kurd girtibû, pirr zalim bû, ji yesaxê pê ve tiştêk nizanibû. Kemal, tê li min dipirse, lê Elî li şexs û qiyafetê wî dinêre, nakeve serê wî û dibê, "Gît ûla. Mudur beg senle konuşmaz."

Mudurbeg jî ez im. Kemal israr dike Elî hat hundir bi Tirkî hezrol sekinî û got: "Mudur beg bir feqîr adem gelmiş, senî gormek istiyor". Salên herbê ne û gelek feqîr dihatin cem me, alîkariyê. Min got: "Kî ye?". Got, "Navê wî Kemal e û Yaşar e, û çavekî wî jî kor e." Hate bîra min, min got: "Lawo ka werin." Yaşar Kemal hat, ji wê rojê min zanibû ku cewherekî wî yê mêraniyê heye. Ez rabûm pê ve, min maç kir û rûniştand û ji vir de wir de em şitexilîn. Bû nîvro loqenta min hebû em çûn me nan xwar, paşê em hatin jor got: "Ezê herim". Min got, bila hema hebekî alîkariya wî be 10 wereqe min danê. Wê çaxê 10 wereqe gelek pere bû. Min kir nekîr qebûl nekîr. Got: "Na tu sax bî, ez dişuxilim, perên min hene. Ez nehatime cem te pereyan." Min nêrî ku insanekî ne wek gelekane e. Min dev jê berda û çû.

Salan da pey salan Kemal



Musa Anter, Yaşar Kemal ji wexta ku hatî Stenbolê ve nêş dikir.

bû Yaşar Kemal. Lê heta îro jî me hevûdu berneda ye. Di 69 an de Kongreya Partiya Karkeran ya Tirkîyê li Beyazîdê di Seraya Spî de çebû. Ez û Kemal jî em çûn. Faşîstan li me komplo çêkiribûn. Bi daran û bi kêran hicûmî me kirin. Pêşî Aziz Nesin girtin, bi tifa û bi pêhnan gêrî erdê kirin, ez û Kemal û Doktor Mustafa Direkçigil li gel hev bûn. Faşîstan hicûmê ser me kir û digotin: "Komünîstno, binamûsno, em hatin we." Hatîn nêzikî me ku li me bixin, Yaşar Kemal bi wî gewdê xwe yî mezin çû ser wan û got: "Komünîst bikutin diya we de werin" û ji heybeta Kemal hemû reviyân. Cardin sal çûn ez hatim girtin Yaşar Kemal bû İnce Memet, ket devê burjûvaziya li Ewrûpa jî, meşhûr bû, berê paseport berî niha bi 40 salî neqidan, min jî û wî jî. Lê paşê dan wî, êdî Kemal nema Kürt kökenli ye. Bû nivîskarekî rûsipiyê Tirkîyê. Lê çi fêde, dinyayê bi wî zanibû ku

eslê wî Kurd e û bi Tirkî dini-vîse, ji ber van eserên wî yên pirr jî nekirin namzetê xelata Nobelê. Li gora qenata heyeta Nobelê insanekî ku ne be xwediyê eslê xwe, ne meqbûl û ne layiqê vê xelatê ye. Kemal niha jî bi wî derdî dişewite. Lê dibê qesta min tune ye di wî îşî de, min bîra van îşan nedibir. Helbet eslê min Kurd e, lê yê bi sîc ne ez im. Osmanî ne, Rûs in, Ermenî ne, cehalet e û Cumhuriyeta Tirkîyê ya niha ye.

Heyfa Yaşar Kemal, lê yê ku heyfa wan e ne Kemal bi tenê ye. Ên wek wî ji berê ve û niha jî pirr in. Wek şairê Dîwanê Nefî, Nabî, Ziya Gökalp, Silêman Nafîz, Elî Emîrî û hwd. Heta ez karim xwe jî bêjim ma çi îşê min bi Tirkan re heye. Lê nivîsên min hemû heta îro bi Tirkî ne. Rica min ew e ku ji, iro û pê ve xortên Kurdan me paqij bikin. Em ne xayin in, lê em nezan û bê mecal bûn, em mecbûr diman li pîpîka dijminan bixin.

welat

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat Navnîşan (Adres) Başmusaşip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ